# *Dîwana Mela Nûriyê Hesarî (4)*

*Dîwana Mela Nûriyê Hesarî* (4) .................................................. 1

# Dîwana

# Mela Nûriyê Hesarî

(1934 – 2011)

**4**

**Mafê çapkirin û belavkirinê parastî ne**

Navê pirtûkê:

**Dîwana Mela Nûriyê Hesarî (4)**

(1934 – 2011)

Pêşgotin:

**Dilawerê Zengî**

Tîprêzî:

**Gulistan Emîn**

Bergsazî û rûpelsazî

**Şengo Dumilî**

Çapa yekem

**2724k - 2024z**

Qamişlo -Roavayê Kurdistanê

Çapxane:

**Mîran**

Qeware: 14c.m X 20c.m

Jimara rûpelan: 288

# Pêrist

Pêşgotin ....................................................................9

Me pir qencî bi dijmin kir ..........................................19

Hey felek jarê ...........................................................26

Hey gelê me ..............................................................28

Newroz tu bi xweşî hatî ..............................................31

Roja Newrozê ...........................................................36

Bawer .......................................................................39

Gelî Kurdan ...............................................................41

Hey nivişta min ..........................................................46

Li ser girtiyên Partî ....................................................58

Newroz .....................................................................63

Em Kurdê welat in ....................................................70

Piştî ku Lînîn rabiwa ................................................72

Newroz ....................................................................83

Hey gelê min ............................................................88

Kurdê li Sûrî Kurdê Cizîrê ..........................................92

Çi çêbûye?! ..........................................................................94
De jaro ezê bimrim ..................................................................99
Şoreşa Geliyê Zîlan .................................................................101
Gazin ........................................................................................... 104
Rabûrî ..........................................................................................107
Kurdistan war û geh e ...........................................................109
Welat ............................................................................................116
Kurdo zû rabe ........................................................................... 112
Textê mezin ................................................................................ 114
Neyar wekî mar e .....................................................................116
Cotkar .......................................................................................... 122
Kur û keçên dilawer ................................................................124
Newroz ........................................................................................ 130
Nêçiyarê Kepez ...................................................................... 138
Dilo jaro ......................................................................................143
Pirsa li dilber ............................................................................147
Dilbera nazik .............................................................................149
Her ji ber jana ..........................................................................153
Hey gulbiharê ..........................................................................155

Dihatim cihên dilberê ................................................156

Hey wax canê ............................................................159

Xwezya bimrim ........................................................161

Gul û beybûn ............................................................163

Hîswerdek li ser dîlokana min ....................................169

Roja ciwan î .............................................................172

Hevala min ................................................................176

Min tiştek dî .............................................................180

Bûka cîhan ...............................................................187

Keçikên me va bihûrîn ...............................................196

Gulzerîn ...................................................................200

Dilber ........................................................................202

Koma Narîn ..............................................................204

Rabe ........................................................................ 208

Sirûda min ................................................................210

Ji bo Mamoste Hadî Behlewî ......................................214

Tu Hêzdan î ...............................................................218

Dost û bira ................................................................221

Pesnê pêxember ........................................................231

Şîna Hesenê Kurd ....................................................239

Şîna Cegerxwîn .........................................................242

Roja veşartina cendekê Cegerxwîn ............................248

Serdana gora Cegerxwîn ...........................................253

Şîna Şêx Ehmedê Xiznewî ..........................................258

Şîna Şêx Ulaeddînê Xiznewî .......................................265

Xurşîd ka Mihemmed?! .............................................268

Şîna Şehîd Remoyê Şêbî ............................................ 272

Şîna pêşmerge Îsmaîl ................................................276

Şîna Hesen Elî ..........................................................281

Şîna Danîş ................................................................ 285

# Pêşgotin

Di nav nivîskarên wêjeya Kurdî de, Mela Nûriyê Hesarî cihekî pir giring digire. Di nava Kurdan de, ew bi nasnavê Seydayê Pirêşan tê naskirin. Di berhem û nivîsandinên xwe de, ew nivîskarekî pir rengareng bû; berhemên wî di warê ziman, ferheng, helbest, çîrok û wergerandinê de hene.

Naveroka mijarên helbestên wî li ser geşkirina hestê neteweyî, welatparêzî û hezkirina Kurd û Kurdistanê ye, li ser hişyariya civaka Kurdî ne, li ser kêmasî, şaşî û gunehên mirovên oldar, şêx, mela û began e, li ser caş, xwefiroş û xinizan e, li ser lehengî û qehremaniya pêşmergeyan û li ser pêşewayê azadîxwazê rizgariya Kurdistanê, serdarê mezin Barzaniyê nemir e, li ser bûyerên xakhejî, gilî û gazin, şer û ceng û şîniyê ne.

Wek me got, piraniya mijarên helbestên wî welathezî, evînî, marş, sirûd, şînî û xweşxwan in. Ew helbestvanekî pir bi bûyer, şînî û şahiyên gelê xwe ve girêdayî bû. Helbestvanekî xwedîhuner û bibehre bû. Di hûnandina helbestê de, rewanbêjekî zîrek û desthil bû, helbestên xwe bi zimanekî rewan, qeşeng, nazik, bedew û şayik hûnandine,

gotinên biyanî di helbestên wî de pir kêm peyda dibin, wateyên gotin û hevokên wî kûr û şîrîn in.

Mela Nûrî ne tenê helbestvanekî bejinbilind bû, belê zimanzanekî zîrek û pir şareza bû. Bi çend zaravayên Kurdî dizanîbû. Lewra wî çend ferheng û rêziman li şûn xwe hiştin. Ferhenga (Kurdî-Kurdî), ferhenga (Kurdî–Tirkî) û ferhenga (Kurmancî- Zazî).

Sed heyf û mixabin ku para bêtir ji berhemên Mela Nûrî hêj destnivîs in û nehatine çapkirin.

Min baş ew nas dikir û têkiliyên me yên hevaltî, dostanî, wêjeyî û zimanî bi hev re hebûn. Mirovekî bi danûstandin bû. Hevalê hevalê xwe bû. Rastgo û xwedî bawerî bû. Zimanxweş, rûgeş û dêmgirnijî bû. Bi perwer û sinçî bû. Bê paye, nefsbiçûk bû. Xwedî raman û pênûseke azad bû. Bi tenahî û dilsoz bû. Helbestvanekî hestnazik û hestenik bû. Bi hêsanî helbestên xwe dafirandin. Evîndar û dildarê xak, av, ba û xweristiya Kurdistanê bû.

Mela Nûrî gelek berhem afirandin. Ji berhemên wî yên çapkirî:

-Şoreşa Barzanî (Helbest- 1995).

-Axlîme: Pêlên Helbesta Kurdî (1996).

-Zeviyek Gazîdan (Helbest-2000). Pêşgotina wê Fewaz Ebdê nivîsandiye.

-Hostanîbêja Zarhaweyên Kurdî- Rêziman-(1996), ku ji aliyê Zeynelabidîn Zinar ve, li Stockholmê hate çapkirin. Careke din ev pirtûk di sala 2024an de, ji hêla malbatê ve li bajarê Qamişlo hatiye çapkirin.

- Axlîma: Pêlên Helbesta Kurdî, sala 1996, li bajarê Şamê hatiye çapkitin.

- Herdû berhemên wî (Zeviyek Gazîdan û Şoreşa Barzanî) û li gel hin helbestên wî yên ku cara yekem tên weşandin, di sala 2023yan de, ji aliyê Tora Medyayî ya Rûdawê, li Hewlêrê - Başûrê Kurdistanê, di nava du bergan de, hatin çapkirin. Pêşgotina wê Besam Mistefa nivîsandiye.

Sê berhemên Seyda ji aliyê malbata wî û bi taybetî ji aliyê kurê wî Ebdulwehabê Mela Nûriyê Hesarî gihiştin destên min. Li ser daxwaza malbatê min her sê berhem amade kirin, sererast kirin û pêşgotin ji wan re nivîsand. Ez, ji dil û can spasiya malbatê û bi taybetî spasiya kekê Ebdulwehab dikim li ser vê baweriyê.

Ew jî ev in:

-Mewlûda Pêxember (Zanhaweya Pêxember), (2024), Qamişlo - Rojavayê Kurdistanê, çapxana

Beyan, pêşgotina wê ji hêla min ve hatiye nivîsandin. Ev Mewlûd yek helbest e li ser yek kêşeyê hatiye hûnandin û ji (505) malikan pêk tê. Di dawiya pirtûkê de helbestek dirêj di pesnê pêxember de heye, ew jî li dora ji (35) malikan hevedudanî ye.

-Dîwana Mela Nûriyê Hesarî bergê (3)yan, li bajarê Qamişlo, li çapxaneya Beyan hat çapkirin. Pêşgotina wê ji hêla min ve hatiye nivîsandin. Ev dîwan ji (48) helbestan pêk tê.

Bêgoman, ev dîwana di nav destên we de, bergê (4)an wê ya dawî be, ji helbestên Mela Nûrî yên ku nehatine çapkirin. Ji ber ku malbatê hemû arşîvên wî dane destên min û bê dudilî û bi lez û bez min jî di du dîwanan de, bergê (3-4)an de amadekirin û kurê wî Ebdulwehab ji kîsî xwe dane çapkirin. Dîwana wî ji (64) helbestan pêk tê. Hejmara tevaya helbestên wî yên ku hatin çapkirin  gihiştin (314) helbestan.

Hêjayî gotinê ye ku pirtûka wî ya bi navê **Axlîma** (pêlên helbesta kurdî), li ber destê min e û nêzîk ne dûr ew ji nû ve tê çapkirin. Bêgoman ez di kar û xebata di ber van berheman de dilşad û bextewer im û ji bo min cihê şanazî û serbilindiyê ye.

## Kurtejiyana Mela Nûriyê Hesarî:

Di sala 1934an de, li Hesarê, gundê Kercewsê, jidayik bûye. Di nava Kurdan de, bi nasnavê Seydayê Pirêşan tê naskirin. Navê diya wî Xanim e, navê bavê wî Mela Yûsifê kurê Emer e. Emer ji gundê Hêştirekê, ji malbata Etmanka, ji şaxê Elikan, ji rema (Hoz) Hevêrkan bûye.

Mele Nûrî ji malbateke xwenda, zana û bîrewer hatiye. Bavê wî Mela bûye, diya wî jî keça melan û jineke xwenda bûye.

Di sala 1939an de, pêşî li cem diya xwe (Xanim) dest bi xwendina Qur'anê kiriye, û li cem wê Mewlûd, Nehculenam, Nûbihar û Rewdne'îm xwendine.

Di sala 1940î de, çaxê ku diya wî li Hesarê giyanê xwe spartiye Xwedê, îcar wî li ba kekê xwe Mela Hisên xwendiye. Lê çaxê ku kekê wî çûye leşkeriyê, îcar bavê wî ew xistiye dibistana bi zimanê Tirkî de, ya ku li Hesarê bûye.

Di 1945an de, çaxê di nofa (sinif) çaran de, dibistana Tirkî dixwend, bavê wî jiyana xwe spartiye Xwedê. Îcar kekê wî Mela Hemîd ew ji dibistanê derxistiye û daniye ber xwendina medresê. Piştî demekê, ew û kekê xwe Mela Nezîr,

çûne gundê Bilêderê, û li cem birayê xwe yê ji dê mane. Pişt re çûye mala xalê xwe Mela Mihemed, li gundê Êlihê (Niha bûye wîlayet û jê re Batman dibêjin), maye. Ji wir jî çûye gundê Kurrika li Bişêriyê, li medreseya Mela Hesenê Tilmizî xwendiye û ders ji Mela Faîqê kurê Mela Hesen girtiye. Piştî demekê ji wir şûnde vegeriyaye û çûye Hesarê. Ew û kekê xwe Mela Hemîd, ji bo xwendinê daketin Binxetê û çûne cem mala Şêx Ehmedê Xiznayê. Li wirê dîsa li cem kekê xwe Mela Hemîd xwendiye heta ku “Sadulaha Gewra“ bidawî kiriye.

Di sala 1949an de, birayê wî Mela Hemîd, çaxê xwendina xwe ya medresê kuta kiriye, di Kanûna Paşî de, vegeriyaye Hesarê, lê Mela Nûrî li Xiznayê maye, îcar li cem Mela Beşîrê Batêrgizî xwendiye. Lê, di dehê meha Heyvdarê 1950î de, Şêx Ehmed çaxê giyanê xwe spartiye Xwedê, ji wir çûye Tilmarûfê û li ba şêx Eladînê kurê Şêx Ehmed xwendiye. Mela Nûrî li wirê bûye pêbawerê Şêx Masûmê kurê Şêx Ehmedê Xiznayî.

Mela Nûrî di 20-saliya xwe de (1954), dest bi nivîsandina bi zimanê Kurdî kiriye, û berhemên xwe hemû bi alfabeya latînî nivîsandine. Camêr digel wê perîşanî, dilêşanî û xizantiya xwe, deh pirtûk kirine malê Pirtûkxaneya Kurdistanê.

Ji destpêka sala 1967an ve, Mela Nûrî li bajarê Qamişlo – Rojavayê Kurdistanê dijiya.

Piştî nexweşiyeke dûrûdirêj, di roja 25. 01. 2011an de, Mela Nûriyê Hesarî (Pirêşan), ji nav me barkir û li goristana Qidûr Begê hate binax-kirin.

Mela Nûriyê Hesarî çend xelat û rêzname wergirtine, wek:

-Xelata Cegerxwîn a afirandina helbestê (2008)

-Bawernameya rêzgirtinê ji festîvala helbesta Kurdî ya 12an li Sûriyê (2007).

-Rêznameyek ji dîdargeha çand û hunerê û kovara Mewasim (2014).

**Ji berhemên wî:**

- Şoreşa Barzanî: Helbest, 1995
-Hostanîbêja Zarhaweyên Kurdî, çapa yekem, Weşanxaneya Çanda Kurdî, Stockholm 1996
-Hostanîbêja Zarhaweyên Kurdî, çapa duyem, Qamişlo, 2024
- Axlîma: Pêlên Helbesta Kurdî, 1996, Şam.
- Rêziman: (Destnivîs).
- Ferhenga Kurdî – Kurdî, (Destnivîs).
- Ferhenga Kurdî – Tirkî, (Destnivîs).

- Ferhenga Kurmancî- Zazî, (Destnivîs).
- Vegerandina li ser Zimanê Erebî (Şarvîn), (Destnivîs). (تأويل اللغة العربية)
- Koledar: Çîrokek Helbestane ye, (Destnivîs).
- Du Mar: Çîrokek Helbestane ye, bi zimanê Erebî ye. (Destnivîs).
- Bîranîn, ji jiyana wî, (Destnivîs).
-Mewlûda Pêxember (Zanhaweya Pêxember), Qamişlo, çapa yekem, pêşgotina Dilawerê Zengî, çapxaneya Beyan, 2024.
-Dîwana Mela Nûriyê Hesarî bergê (3)yan, pêşgotina Dilawerê Zengî, çapa yekem, li bajarê Qamişlo, li çapxaneya Mîran, sala 2024an hat çapkirin.

**Dilawerê Zengî**

Qamişlo-Roavayê Kurdistanê

01.08.2024

# Dîwana

# Mela Nûriyê Hesarî

(1934 – 2011)

**4**

## Me pir qencî bi dijmin kir

Me pir qencî bi dijmin kir, belê tev çû bi avê de
Me dotî çêleka Mitran, di paşê pehniyek lê da

Di dawî de rehê digrin neyarê Kurd û Kurdistan
Di piştî şîr ji dê xwarin, kirin gez çîçek û bistan

Ji pêşî de dibên: Rovî li şûna şêr dikî gêre
Di piştî kêr giha hestî, çi bêjim bê ked û kêr e

Belê çibkim ji kêra dil, ezê bêjim neyar çawa
Li Kurdan çêkirin pîlan bi ol û xap û sed awa

Neyarê me gelek rabûn belê tev ê bi zorê ne
Hinek çûn û hinek mane li ser kursî bi dorê ne

Evê zorê dibê: Zor im, bi serbestî xwe nakî dost
Merov haya xwe jê tînî hetanî reh digêrî bost

Belê yê ku bi dostanî dikî mala meriv wêran
Ew e yê ku di bin zik de, dil û cana dikî dêran

Bi vî rengî ereb rabûn li ser Kurdan bi dostanî
Misilmanî kirin perde, welat girtin bi hostanî

Li pey rêça Zeradeştî, Muhemmed hate cîhanê
Bi çavên qenciyê nêrî li Kurdistan û Îranê

Belê go: Ez ji cem Yezdan ji bo her kes verêbû me
Di hin tişta ji Zerdeştî, li gor çaxê cihê bû me

Me Kurdan bê şer û kuştin dikir bawer bi ola wî
Me ser danî ji bo Yezdan li jêrî ling û sola wî

Muhemmed go: Heçî Muslim wekî pêşî xwedî cî ne
Reş û gewr û gelê cîhan, li ba min tev Qureyşî ne

Kesê go bê: Xwedê nîne, Muhemmed dijminê wî bû
Kesê go bê: Yek e Yezdan, li cem wî, ew ji xwer dî bû

Li pey Mûsa, li pey Îsa kesê dînê xwe ajotin
Didîtin: Dost û Yezdanî, li ser wa her nekir gotin

Li yek carî nekir zorek ji bo dînê misilmanî
Digo: Ber kes ne bî Muslim bi tirsoyan, bi dilmanî

Digo: Ê go bibî Muslim, li wa ber kes nekî zorê
Kesê zorê li wan çêkin, di gel wa ez diçim gorê

Kesê dînê misilmanî bi zor û dar hilanî ba..
Ewî hingê bi mêranî ji wan haya xwe anî ba

Kesê pêşî nehata wî, li wir carek nekir dozek
Kesê ev dîn bixwestana ji ber xwe wî dida sozek

Digo: Ber dîn bi kêfê bî, kesê ku bê veger nîne
Riya min a Buhiştê ye, kul û derd û keser nîne

Li pey wî ev ereb rabûn dixwestin dewletê çêkin
Kesê go bê: Ne bindest im, di cih de em serî jêkin

Serî dan kuştin û zorê, nema zanin çi bû Islam
Ji bo ew jî wekî Qeyser di cîhan de bibin endam

Nema keskî li wa nêrî bi çavên qencî û zanîn
Ewan avêt riya qencî, riyê zorê ji xwer danîn

Ji nû çavên xwe berdane koç û eywan û bajara
Digotin: Em serekdar in çiye ev Qeyser û Dara?

Nema zanin çi Îsa ye, çi Mûsa ye, çi Zerdeşt e
Li cem wan kuştina mêra dibû kêf û ger û geşt e

Kesê wek wa nema karî di cengê de bikin zorê
Di ber zêr û gulîsora, ereb tevde kirin gorê

Belê keskî wekî wa xwe nema berda bi cenga ve
Ji bo herdû nebin winda, diberdan wan bi dev wa ve

Ciwamêra didîn go ev ereb tevde wekî hov in
Ji wan re xwe kirin serbest dizanîn ew li bin tov in

Di Îran û di Şamê de, li ser texta dirûniştin
Ji Kurd û furs û bindesta, bi kêfa xwe meriv kuştin

Nema karî bi Islamê bikin ferman, nema çêbû
Ewa dînek ji nû çêkir ji deh para hinek jê bû

Ji Pêxember Qur'an çêbû ereb nû bûn wekî Qeyser
Neyarî dane Pêxember, nema zanin: Elî Heyder

Belê Kurdan di ber wa de, bi can û dil kirin arî
Di piştî kuştin û zorê, di gel wan pir kirin yarî

Dilê Kurdan ji wan nedma, li pêxember kirin xatir
Hin û hin Kurd kirin winda, heta ku em kirin yaxur

Sedê salan bihurtin em bi vî karî de winda ne
Li vê navê binalînin, wekî totak û kunda ne

Dixwim sondê bi Qur'anê, Muhemed dijminê wa ye
Gelê kurdî tenê zanin di îro de li pey ma ye

Li ser zarê Ebû Qasim çi tiştê ev ereb bêjin
Ji alî kêmiya kurda, hemû bextê xwe davêjin

Ereb rabûn ji bo Islam, nego rabin bibin Qeyser
Nego Kurdan ji Kurdistan bi navê dîn werînin der!!

Nebêjin: Em bijarî ne, ji Yezdan in, kurê wî ne
Nego zarê me winda kir, ne Rûsîtî bikin dîn e

Nebêjin: Em Mesîhî ne, nebêjin em ji Aşûr in
Nebêjin: Em kurê Sam in, ji Islamê gelek dûr in

Nego Ke'bê bikin dosta Kirimlên bingeha Lînîn
Nego d' canê misilmana bixin destê zilamê Çîn

Niha em hew didin pey wa, emê dînê xwe ava kin
Emê bûka xwe bughêzin, emê lawê xwe zava kin

Ji Kurdan qehreman rabûn, emê êdî li pey wa bin
Wekî şêrê li Barzanê, bila em Kurd bi wî şa bin

Me naskirye riya qencî, me xalê dijmina dîtin
Me zanî ev gelê kurdî kurê Sobar û hem Sît in

Bijî her Mustefa Barzan, ewî şewqa xwe da cana
Ji ber çava birin tarî, dibêjin: Em ji nû vana

Bijî ev Kurd û Kurdistan heta roja bimînim sax
Ezê bêjim sirûdê wê ji bo dil jê bidêrî dax.

***

## Hey felek jarê

Hey felek jarê, heştê adarê
Newroz dirabû, li Kurdistanê
Newroz di pêşî, cejna Kurdan bû
Peyde bela bû l' geştê cîhan
Bi rêz û ayîn. Serbest dirabû
Di hingê em bûn xwedyê Îranê
Xot û qîzê kurd, her sal vê rojê
Tev diçin çola, ji bo seyranê
Diçûn ber Cûdî, Agirî û Laleş
Dibû gurmîna saz û dîlanê
Kesk û sor û zer, tevde dibûn rist
Gul şîn dihatin, li ber xwêdanê
Ma qey Tu nabê: Ew dem çima çû?
Li dijmin rakin qîr û halanê
Dijmin winda kir ew roja hêja
Bi zor û kuştin, dar û lêdanê
Bînin ber çava zor û bindestî
Bila em dîsa herin talanê
Heyfa Newrozê, heyfa Kurdistan

Ger bibne winda, herin wêranê
Hêjaye em tev li ber wan bigrin
Ronik bibarin rengê baranê
De rabin dîsa Newrozê çêkin
Ji dil derxînin, vê qehr û janê
Moma tev pêxin, agir hildin jor
Bavêjin dara.. textê hêlanê
Ala kesk û sor.. raser diyaran
Hildin li Mûş û Bedlîs û Wanê
Bikin bûk û qîz, bi xeml û xêzan
Farqîn û Amed şehrê Batmanê
Kerkûk û Hewlêr, welatê Barzan
Bikin dar û gul.. rengê seywanê
Ciwan û zarok.. dîloka bêjin
Şalûl û bilbil.. bêne serdanê
Îran û Tirk û Îraq û Sûrî
Newrozê çêkin .. heta Libnanê
Bijî ev Newroz.. Kurd û Kurdistan
Bi kêf û nazî.. hem şadimanî.

***

# Hey gelê me

Hey gelê mey şiyar, vaye roja te hat
Şahî û kêfxweşî, em kirin har û mat
Roj bi şewqa xwe ve hate raser welat
Rohnî da Bîres û Agrî û hem Xelat
Da li hawîr ewan Kurd bidêrin civat

Cejn û Newroz tu bê ser seran ser sera
Kurd li bendî te ne, kêf giha her dera

Xan û eywanê Kurd tevde bûn wek Buhişt
Bêhn û dar û bihar, derd û janê me: kuşt
Qîz û xortê ciwan, çol û der: kirne mişt
Tûtik û çûk û fir, tevde nalîn û qişt
Leşker û gel rewîn ber bi çola bereşt

Cejn û Newroz tu bê ser seran ser sera
Kurd li bendî te ne, kêf giha ber dera

Tevde pîroz bikin kurdino ya we ye
Ê ku ew daniye sermiyan Kawe ye
Dem diçin ew neçû her li yek hawe ye
Dijmina ew nebir tev ji tirsa xwe ye
Lok û posat û çek jêrî ala we ye

Cejn û Newroz tu bê ser seran ser sera
Kurd li bendî te ne, kêf giha her dera

Ev cejin a we ye, her deman dê hebî
Wê cîhan tev herî çaxê ku ew nebî
Kurd heye her deman wê li text paşe bî
Dê li Hemrîn li Agrî li ser Gare bî
Bo heyîna te Kurd her divê palr bî

Cejn û Newroz tu bê ser seran ser sera
Kurd li bendî te ne, kêf giha her dera

Ev cejin pir kevin a gelê Arî ye
Em ji bo wê dikin her deman zarî ye

Rinc û zor Kurd gelek bo te her xwariye
Hîn ji çaxê qiran û şehê Darî ye
Kurd ne hişt ew herî hey li gor kariye

Cejn û Newroz tu bê ser seran ser sera
Kurd li bendî te ne, kêf giha her dera.

***

## Newroz tu bi xweşî hatî

Newroz tu hatî bi xweşî

Bi te dilê Kurd bû geşî

Ji ser me çû zor û reşî

Bêhna gula li Kurd weşî

Newroz tu hatî sersera

Dil bûye kêf û şadîman

Şewqa te daye her dera

Newroz tu mizgîna me ye

Tu rohniya warê me ye

Tu dermanê canê me ye

Tu her li ser bîra me ye

Newroz tu hatî sersera

Dil bûye kêf û şadîman

Şewqa te daye her dera

Bûka biharê her tuwî

Her sal divê çaxê niwî

Demek dirêj winda biwî

Dîsa were kat ti l' kiwî

Newroz tu hatî sersera

Dil bûye kêf û şadîman

Şewqa te daye her dera

Cîhan hemî va bûye bîn

Xorta dikî serxoş û dîn

Nêv wan gulê narinc û şîn

Seyran dikin Şêrîn û Zîn

Newroz tu hatî sersera

Dil bûye kêf û şadîman

Şewqa te daye her dera

Kawe ji me'r tu aniye

Tu daye dest Barzaniya

Li ser milê kurd daniye

Îro ji te'r nîşaniye

Newroz tu hatî sersera

Dil bûye kêf û şadîman

Şewqa te daye her dera

Welat bi te bûye bihar

Va bişkivîn sêv û hinar

Keçik bi qolan û guhar

Çivîk dikin qîr û hewar

Newroz tu hatî sersera

Dil bûye kêf û şadîman

Şewqa te daye her dera

Çol û çiya tev bûne mûm

Tîrêj didin Îran û Rûm

Dijmin hemî bû ser nixûm

Kêfa li min da vaye çûm

Newroz tu hatî sersera

Dil bûye kêf û şadîman

Şewqa te daye her dera

Newroz tu îro serwerî

Naz û şepal û dilberî

Pembehî û sor û zerî

Xortan tu danî ser serî

Newroz tu hatî sersera

Dil bûye kêf û şadîman

Şewqa te daye her dera

Sêrwan û Mûsil, Şehrezor

Seplax û Kermanşah û Lor

Bedlîs û Kurdê çol û Tor

Dîlan û kêf kirne hilor

Newroz tu hatî sersera

Dil bûye kêf û şadîman

Şewqa te daye her dera

Newroz tu hîmê şadiye

Nîşan ji bo Azadiye

Rewşa welatê Madî ye

Dergistiya şêr Qadî ye

Newroz tu hatî sersera

Dil bûye kêf û şadîman

Şewqa te daye her dera

Barzanî Tu anî welat

Wî li te kir zêr û xelat

Tû danî ser goh û kelat

Bi Barzanî roja te hat

Newroz tu hatî sersera

Dil bûye kêf û şadîman

Şewqa te daye her dera

Bijî bira Kurd û ereb

Ji vir heta Şam û Heleb

Qesra neyaran bû neqeb

Ser bû li wa nav û kezeb

Newroz tu hatî sersera

Dil bûye kêf û şadîman

Şewqa te daye her dera

Barzan û Kawa her bijin

Kurd û Kurdistan her bijin

Pêşmerge û her mêr û jin

Dijmin bi xurtî bikujin

Newroz tu hatî sersera

Dil bûye kêf û şadîman

Şewqa te daye her dera

***

## Roja Newrozê

Roja Newrozê, roja dê û bava
Îro Tu hatî ser herdû çava
Em te jibîr nakin ti çax û gava
Bendî te mane, sed bûk û zava

Her sal vî çaxî pêşya biharê
Çaxê em dighên heştê Adarê
Simbil dibî der di ba simbarê
Çêdikin bo te, em kar û barê

Roja te derket bi kêf û şadî
Tîrêja xwe da welatê Madî
Tînî bîra kurd, pesnê nijadî
Min bax û bustan, deşt û çiya dî

Welat seraser dar û giya ye
Nav gul û nêrgiz, kêf û sema ye

Mizgîn piçûkan, hawîr gihaye
Bilbilê dilxwîn, di nêv gula ye

Ev xort û ev qîz, bi xeml û xêz in
Li geşt û raxan, bi rist û rêz in
Dayik û zarok, diber himbêz in
Li her kenaran, tev xêz û bêz in

Raserî çiya, moma bikin geş
Rohnî bikin tev, war û cihê reş
Zêran bipêçin, li al û zergeş
Hevdû bi maç in, cejna bikin xweş

Bêjin sirûdan, pê re binalin
Gulê sor û zer, di rengê lal in
Keçê gulîsor, bi xişr û xal in
Fistanê gelgûn, qadê dimalin

Çêbikin govend, gula bidin hev
Bêhna birêjin, ta ku bibî şev

Bibosin ji hev ser û çav û dev
Kawa ji bo Te amade kir ev

Bikin berz û rev, komê siwara
Alan biçkînin, li ser zinara
Rûnin ber siya gwîz û hinara
Mizgîn bela kin, li her kenara

Tû ser seran tê hey roja Newroz
Roja Kurdistan, ez dikim pîroz
Em didin hevdû sed peyman û soz
Bona te em dê herdem bikin doz.

***

# Bawer

Bawer zan im ku îro rojek başê cîhan e
Kêf û Newroz û deng e, qîrîn û şadîman e
Qîzik rist û rêşî ne, xweş govend û dîlan e
Kofî ser porê qîza, rengê dar û seywan e
Şewqa zêr û gelarî, tîrêj da ser keywan e

Pesnê ser vê govendê, ger bê gotin, kî zanî?
Ev ayîna ku çêbû, nêv wî bax û bustan î
Ev guldarê sor û zer, av û robar û kanî
Rengê roja Suleyman, Belqîsa Bano anî
Tevlî rext û textê wê, çaxê ku vajî danî

Hawîr çolan leylan in, rengê êrîş û ceng e
Kîja qîzik xuya bû, tê bêjî: Ev ya şeng e
Xort û merdê nûhatî, hê nû hatin ser beng e
Wergirtin şal û kolos, ser mafûrê deh reng e
Min go: Zûka bin derbas, çû roja min.. dereng e

Tev rabin rabin rabin, îro geşt û seyran e
Derbin ber goh û gaza, pir serjêkin heyran e
Hûrik hûrik der bin pêş, wê gul bêtin dêran e
Ew lîsê hûn dibînin ê piling û şêran e
Hov in gelkî merd û mêr, tevlî hespa hêran e

Hember hev bûn: Şûr û zêr, bû gêdûk û bû bahoz
Ji mêjgûla: Kil daket, tevlî miskê çêkir toz
Di hingê mer û qîza, guhartin bo hevdû soz
Her mêr û her xatûnan, cejna hevdû kir pîroz
Suruştê ser asîman, hatin bo kêf û mîroz

Xwendin ser goh û lata, balind û her mar û mûr
Çêkir kêf û serşopî, xwedya xiftanê gulhûr
Hatin mişq û bezrînê, xwedyê van şûrê lahûr
Bû hêrîna hespê şê, qîrîna saz û tenbûr
Ava Mezin rawesta.. tevlî Firat û Xabûr.

***

## Gelî kurdan

Gelî Kurdan çima îro
Ji hevdû hûn her bela ne
Heçî bend û civakê pir
Dibin ser êş û hem jan e

Ji hevdû tar û mar bûne
Dibin destê yê nezan e
Bibin yek dest û yek partî
Li Kurd ew nabî ziyan e

Welat îro dibin dest e
Binêrin bê ev çi zîz e
Dikim goman ji lawê xwe
Dikî gazin û hem bîz e

Bixin hev dest û zendê xwe
Di gel hev hûn rabin kar e
Dilê xort û keçê kurda

Ji vî karê we pir sar e

Şiyar bin hey delalê min
We doz rakir bû ji zûde
Berê xwe bidne bavê xwe
Hûnê herne ma bi ku de?

Dema şah û bega çûye
Belengaz ew tev bira ne
Ji ber doza Welatê kurd
Bi hevdû re tev gihane

Kekê min herne malê hev
Bi rastî bî ne bi pîlan
Xuhê min herne govendê
Bi kêfa dil û bi lîlan

Kesê hevsar bi destê wan
Nebin yek wan her derênin
Girêdin wan bi zora xwe

Bi ser hevdû de hûn bênin

Wekî ku em tevde Kurd in
Û ji bo hevdû xwedî ne
Çiqa şerme ji bona me
Kû em tev pêncî kerî ne

Li ku bî em gelê Kurdan
Belengaz û him hejar in
Ji bo çi em ji hevdûr e
Ne dost in lê em neyar in

Çilo wê Kurd birayê xwe
Bidî kuştin, hey hewar e
Birakuştin bi zanin ku
Li gor kêfa yê neyar e

Çi heyfe Kurd werin kuştin
Welat sêwî ew bimênî
Mixabin ku ewî laşî

Dikin perçe û hem çênî

Çilo bî kurd ji hev dûr e
Heval û dost û hem piştin
Wekî waye çima kurdan
Ji Kurdê dî her dikuştin

Berê Kurdan di gel hevdû
Çi kîn û ew berberî kir
Evê kînê welatê me
Bire paş û bê serî kir

Niha Kurdê welatparêz
Dixwazin ew wekî wa kin
Di dil de xwe dikin axa
Bi navê Kurd tew dibakin

Heke raste bidin pey hev
Di partîkê de tev yek bin
Hûnê hingî ne.... a...... ....

Bi rûmet bin, hûn gelek bin

Wekî pêşî nebin ser hişk
Ji bo Kurdan serî dax e
Bikin şermê ji cîhanê
Bizanin ev çi ton çaxe

Xwezî ev komikê kurda
Bibûna yek di vê gavê
Dixwazim vê ji Kurdê baş
Mi tiştek dî j' niha navê.

***

## Hey nivişta min

Kê mejî çirand? Kê tarî hiland?
Kî giha esmam? Kê dijmin gurand?
Hey nivişta min

Ziman kê naskir? Kê ew daskir?
Ew kir wek pala Pale bi daskir
Hey nivişta min

Bizanin kî bû? Ê pêşî dî bû
Yê ev nivîsand Bi nav Nûrî bû
Hey nivişta min

Va bi serbestî Bê tirs û mestî
Bo te dikim xîz Ez bi vî destî
Hey nivişta min

Aram zarê me Di bin darê me

Birin ji bo xwe　　Ji vî warê me

Hey nivişta min

Berî hezaran　　Ji sal û caran

Aram hatin vir　　rengê hejaran

Hey nivişta min

Bi xew bê zar bûn　　Bê îş û kar bûn

Hîn bûn zarê me　　Hinek şiyar bûn

Hey nivişta min

Kurdî ne kurdî　　Ji girs û hûr dî

Bûn zarekî nû　　Hîn dema gurdî

Hey nivişta min

Xwe dan alîkî　　Ketin ser pîkî

Bo kuştina me　　Kirin xerîkî

Hey nivişta min

Dem, çax direêj bûn　　Ji me werbêj bûn

Ereb nû çêbûn Hin hin em gêj bûn

Hey nivişta min

Mîdî hilatin Ereb dihatin

Bû misilmanî Kurdî bihatin

Hey nivişta min

Xîzê me sot in Darê me kot in

Kurdî nexwînin Heşkerî gotin

Hey nivişta min

Gotin Kurdistan Kete bin destan

Ji bo erebî Herin dibistan

Hey nivişta min

Kurdî jibîr bû Erebî şîr bû

Erebî geş bû Zarê me pîr bû

Hey nivişta min

Me dikir goman Di rengê hozan

Kurdî çê nabî		Ji bo mirovan

Hey nivişta min

Piştî  Muhemmed		Hezar û çarsed

Sal va buhûrîn		Keskî nekir ked

Hey nivişta min

Zana yên kurda		Ji hûr û girda

Ne peyvîn bo zar		Ji vir de, wir da

Hey nivişta min

Ne gotin pêşî		Bi rist û rêşî

Kurdî binyat e		Li ser bû kêşî

Hey nivişta min

Zarê me kûr e		Çaxê wî dûr e

Erebî jê ye		Bi qurm û tûr e

Hey nivişta min

Keskî nezanî		Min tê deranî

Zarê erebî　　Kurdan ew danî

Hey nivişta min

Min bêje xwendin　　Min tîp vejandin
Min dî herdû zar　　Çilo ne, çend in

Hey nivişta min

Erebî xweşik　　Min dî wek çermik
Hatiye pêçan　　Li kurdî tenik

Hey nivişta min

Hingî min kola　　Bi nûkê pola
Min dur deranî　　Ji latê hola

Hey nivişta min

Min çermik rakir　　Kurdî xuya kir
Hişê min bû mat　　Êdî min bakir

Hey nivişta min

Min got: hewar e　　Werin, diyar e

Li xap û rîpan    Ez bûm şiyar e

Hey nivişta min

Min zar deranî    Bû rengê kanî

Li ber çavên kurd    Bê tirs min danî

Hey nivişta min

Min dabû sonda    Li şehr û gunda

Va nûka min dî    Kurdî ya winda

Hey nivişta min

Li Kurd bû pêjin    Min go: De bêjin

Ka ev ne rast e    Hûn çi dibêjin

Hey nivişta min

Hinka digo: Na!    Hinka digo: A!

"A" ya "ne" rastî    Gotinek ber ba

Hey nivişta min

Bi hinka reş bû    Bi hinka xweş bû

Hinek bi "a", "na" Dilê wan beş bû

Hey nivişta min

Hina giranî Gotin çi zanî

Tu bi vî tiştî Tu pir xizan î

Hey nivişta min

Hinka go: Qur'an Bi vî hawê han

Dibî bê rûmet Heger bê tevdan

Hey nivişta min

Hinka ji ber xwe Gotin: Xwe derxe

Ji van gunehan Hawîr te merx e

Hey nivişta min

Hinka ji kîn î Gotin: Tu dîn î!

Tu vê dibêjî Tu şaş dibînî

Hey nivişta min

Min go: Ne dîn im Ez dûr dibînim

Ne gunehkar im — Ne dij bi kîn im

Hey nivişta min

Ew e gunehkar — Ku bibî hişyar

Ne bêjî rastî — Lê bikî veşar

Hey nivişta min

Ez naveşêrim — Ez dinihêrim

Rastî dibêjim — Serbest û şêr im

Hey nivişta min

Gelek dem çûbûn — Ereb ketin şûn

Bi zarê Qureyş — Qur'anê girt gûn

Hey nivişta min

Kurdî binyat e — Erebî kat e

Ji kurdî çêbû — hûn nebin mat e

Hey nivişta min

Ka hê li ku ye? — Niha ev nû ye

Ber çavên Kurdan — Tarî û dû ye

Hey nivişta min

Kurd ne xewar in — Tev ne dewar in
Tişta hiltînin — Rengê kewar in
Hey nivişta min

Kurd ne nezan in — Ne hiş giran
Lê îro ceng e — Tev dilbijar in
Hey nivişta min

Di piştî sala — Ku dîtin ala
Li vê niviştê — wê bibin vala
Hey nivişta min
Wê bi ling û dev — Tevde bikin rev
Xîz û pelê te — Wê bidin berhev
Hey nivişta min

Her Kurdê pir kêr — Wê jê bibî fêr
Wê nû binêrî — Hestî giha kêr
Hey nivişta min

Çaxê bixênî Van peyvên çênî
Wê ji nav û dil Nalîn derênî
Hey nivişta min

Wê bi du lêva Di rengê sêva
Maçkin pelê te Kurd ji berê da
Hey nivişta min

Di piştî seyra Wê bêjin: Heyra
Ev mirov daket Ji nav siteyra
Hey nivişta min

Ev çiqas mêr e Çendî bi kêr e
Wî ne nihêrî Li jor û jêr e
Hey nivişta min

Wî ev nivîsî Her dem diçîsî
Derman e ev bo Birçî û tîsî
Hey nivişta min

Ev peyvê pir hûr kirin beş û cûr
Çi bîrewer bû Serî nekir tûr

Hey nivişta min

Li nav neyara Derî dîdara
Li hundirê xwe Dadiket kara

Hey nivişta min

Wî mû qelaşt in Wî mar kevaşt in
Wî hîm deranî Wî dur pelaşt in

Hey nivişta min

Aferim jê re Mejyê wî zêr e
Di vê de yek bû Kes nebû pê re

Hey nivişta min

Wî çilo çêkir Çilo xwe pê kir
Wî çilo bîr bir Ma wekî kê kir

Hey nivişta min

Niha dibêjim: Va ez negêj im

Li bersiva wan Ne jîndirêj im
Hey nivişta min

Keskî berî min Yan li derî min
Çê nekir ev tişt Li berberî min
Hey nivişta min

Keskî nebir bîr Keskî ne da'm sîr
Bi xwe pê rabûm Tenê min da şîr
Hey nivişta min

Pêncî û neh rist Wekî şeh û bist
Çêbûn mi bes kir Min perde daxist
Hey nivişta min.

***

## Li ser girtiyên Partî

Kurdên li Sûrî kar dikin, xweş nasdikin rêça welat
Pişt in ji bo Kurdê cîhan, der xwendina rêz û xebat

Her sal Newroz tê kar dikî, her dem bi aştî badikî
Kîn û gir û berberiyê, ji nîv Partiyên Kurd radikî

Newroz niha wergirtiye, postê reş û xeftanê reş
Rahiştiye gurzê gula ew gul zer û narîn û geş

Pêşmerge wê tev kom bibin bona ewan çek aniye
Wê pir belakî perweya bo wan kesê ku sêwî ye

Hetwana dermana bidî, jar û birîndarên şoreş
Ê dilşikestî dil bi kul pê kêf bikin pê bihne xweş

Rast û çep û her Partiyên Kurdan bikî yek dest û bend
Her girtiyê Kurdan hebin derxî ji peydergah û zend

Yek yek li mala ger dikî gul çîçeka vala dikî
Pirsa li benda wan dikî maç li serê pala dikî

Her sê hevalên me'y li vir, ew girtiyê deh sala ne
Ew ronikê çavên me ne, her dem li ser bîra me ne

Ez bi keser pîroz dikim cejna ewan her sê bira
Ew di zindan û qulgeha şewqê didin rengê çira

Fexrî, Nezîr û Ebdullah her dem ji dil nabin cuda
Dê ew ji zindanê werin hêvî dikin em ji Xweda

Barzanî ev Newroz bi me der vê demê kir heşkerî
Piştî dema Kawa ewî Newroz bi xurtî bir serî

Kawa û Barzanî bijîn Mesûd, Idrîs her hebin
Îsa û Leyla sax bibin, Kurdê li cîhan kêm nebin

Qasimlo her pêşve herî pêşmerge hem mestir bibin
Newroz ji nû serbest bibî, hûn jî hemû çavên mi bin

Sed carî ez pîroz dikim cejna we hey Kurdê ciwan
Ê xwendevan û karker û cotkar û gavan û şivan

Ev bû du sal Barzanî çû Newroz li pey wî hatiye
Pir hilgirî bo Mustefa şîn û reşî wergirtiye

Va çûye ser gora ewî da wî ji nû pîroz bikî
Da jê re bêjî vaye Kurd piştî te re pir doz dikî

Mesûd wekî şêr û piling bazdaye ser pozê çiya
Da ew bikî aza bi lez war û cihê bav û diya

Şabaş ji bo pêşmergeyan ji nû giyan gorî dikin
Ew têne kuştin pîrebî her sêwiya lorî dikin

Newroz diya Kurdên reben dîsa serî daye welat
Da meyzekî bê kanî Kurd hê jî dikî ceng û xebat

Hem wê binêrî kanî Kurd çend lawê ewê pêşmerge ne
Da zanibî ew pêşmerge dilkêf in yan şerpeze ne

Hat û li Kurdistan gerî zindan bi zindan meyzekir
Bêhtir ji wan salê berê derd û kul û jan peyde kir

Lewra di zindan û qula, nalîn ji Kurdan radibû
Dijmin bi nalîna ewan şabaş dida pir şadibû

Hin xort û keç bazdan çiya, jar û reben jînê dikin
Kurdê nezan û dijmina dest dane hev kînê dikin

Hîn wek me vê koma li vir dizî li hevdû kom dibin
Dengek ji lingê gêrikê ku tê hemû em çom dibin

Dar û şeqam û qîteben, hem dem li ber çavê me ye
Çav û guhê van dijmina hawîr li me bê perde ye

Newroz li Îraqê nerî pêşmerge dîtin hêz û lek
Dîsa wekî çaxê berê hilgirtibûn mertal û çek

Mesûd li pey çavên xwe re ceng xistiye destê xwe de
Hêvî ji Yezdanî heye, pir e Mesûd bikî bo me ked e

Kurdê li Îran bûne kar sîng dane ber top û tifing

Kurdê li Tirkî dikelin êrîş dikin rengê piling.

***

# Newroz

Em dê Newrozê jîn bikin
Em vê gulê zû bîn bikin
Bo serxwebûna vî cihî
Wek Restem û Gurgîn bikin

Lawê te mêr û berber in
Mêrxwaz û şêr û leşker in
Bo te ciwan canê xwe dan
Bê dest û ling û bê ser in

Law in  gelek pêşmerge ne
Bo te hemî li derge ne
Cengê dikin hember neyar
Dil keser û kul cerge ne

Kî radibî cengê dikin
Pirsê li ser bengê dikin

Mewdan û can û xaniya
Gorî ji bo şengê dikin

Der vî sedê bîsta gelek
Hawîr te bûn kom û xelat
Bo te dixwazin serxwebûn
Yan ji dilan çûye felek

Barzanî tu serbest kirî
Ji nav lepê dijmin birî
Çil salî bêhtir şer dikir
Da ev Newroz hew bimirî

Şêrek li şûna wî heye
Mesûd wekî wî bixwe ye
Şoreş bi destan girtî ye
Ew rêberek pir zane ye

Kurd li Îran amade ne
Li Tirkî kar û cerde ne

Li Sûrî guhdarî dikin

Bo te bi kêf û zerde ne

Ji bo te wan darê gula

Danîne ser çog û mila

Kêf û dîlan û şahî ye

Wergirtine rengê cila

Pêş te dixwînin her çivîk

Nû pişkivîn sêv û bihîk

Qîzik memûşa çêdikin

Bi derziya sîx û tilîk

Çavan ji bo te kil dikin

Alan li pêş te hildidin

Li ser mafûr û xaliya

Rêz rêz bi hev re mildidin

Alav û mûm û feneran

Şewqa xwe dane her deran

Ronik ji çavan diwerin
Hênik dikin her keseran

Em bi dizî Newroz dikin
Her girtiya pîroz dikin
Ê ku di zindan û qulan
Em bo ewan pir doz dikin

Ma qey neşerm e hey neyar
Hey mafxwero hey çavnebar
Van girtiya berdin bes e
Hûn kerkirin qîr û hewar

Kurd bo neyaran bûne berx
Kuştî li çola bûne kerx
Em bûn xwedî nav û welat
Çep zîvirî dolab û çerx

Dijmin her û her çûr dikî
Kurda ji ber hev dûr dikî

Ev neh sedê salan wisa
Can û dilan xapûr dikî

Lê çi bibî pola ne em
Hişk û qir û hola ne em
Renc bi me re bûye heval
Cengawerê çola ne em

Dest hilava min li we bî
Ev civîna me her hebî
Sondê dixwim ez bi çiya
Bi xwîn û laşê kuştiya

Em bi Newrozê kom dibin
Kurd her weha perçe nebî
Bi axa ser dilê Barzan
Bi sêwî û her jinbiya

Newroz bi serbestî were
Rûne li ser dest û ser e

Hûn sax bimînin hey bira
Newroz bibî rengê çire

Em tev li ber bendî te ne
Xanim Kurdistan ev der e
Hûn salek dî serbest bikin
Li deşt û bêlan û gir e

Ev der cih û baxê te ne
Ev zaxur û daxê te ne
Ev gund û bajar û zevî
Heywan û hescaxê te ne

Em lawê Restemê Zal in
Xudanê vî cihê kal in
Pilingê dev bi xwîn bo te
Bi ax û zarî û nal in

Em in Kurdê kurê Kawa
Li Barzan û vir û ba we

Ji bo te can dikin gorî
Jin û mêr û keç û lawa

Em in Kurmanc, em in Sorî
Em in Mukrî, em in Lorî
Teva xwarin ji bona te
Dijmin û rencî û zorî

Ji Cûdî em belav bûne
Ji nav geştê Gela zû ne
Ji Sobar û ji Mîtan in
Hinavê wan dila xûn in

Newroz tu Kurd xweş nasdikî
Bi wan re dem derbas dikî
Em hevîndarê te ne
Kî tê xwe zû pêxwes dikî

***

## Em Kurdê welat in

Em Kurdê welat heçî dil şewat
Agrî û Xelat niha bûne mat
Ji bo wan divê gelek kêferat

Hey kurê leheng li Kurd bûye ceng
Bidin qîr û deng di rengê siteng
Herin dijmina bes e bû dereng

Pilingê dilêr kurê Zal û şêr
Kesê barbuhêr birîndar û mêr
Wekî aş û deng seran tu bihêr

Hey gelê lawa şûnmayê Kawa
Xwedyên kelawa sed reng û awa
Dijmin dikî şer jênekin sawa

Bidin ser neyar wekî şêrê har

Agir nekin sar bi cengê dijwar
Senger û hêzan bikin tar û mar

Çaxê hebûn em bi şûr û kelem
Ev Rûm û Ecem di rengê belem
Di dest me de bûn bi hefsar û gem

Bi bost û gaza hûn bikin aza
Ji dest beraza welatê baza
Hûn bêjin bi fort: Hê Kurd neraza

***

# Piştî ku Lînîn rabiwa

Piştî ku Lînîn rabiwa
Her Kurd li pey Rûsa diçûn
Pesê wî em bêhtir didin
Lê her ji me ew çavmiç in

Çend şoreşê Kurd çêdibin
Rûsya li wan guhdar nebû
Ew hêviya me'y Rûs dikir
Tev bûye leylan berze bû

Her carekê pelpa dikî
Her yek bi reng û ravekî
Em Kurd ji wî bawer dikin
Her yek diçî şer davekî

Carek dibê: Pir sal neçûn
Doza we hê nû çêbiwa

Ew xaniyê hûn avekin
Yek qorê ji nûka lê biwa

Carek dibê: Ka pêşkevin
Hûn pir li paş in, vî demî
Benda Emêrka radixî
Pêşya we da vî kelemî

Carek dibê: Hûn ney me ne
Hûn kengî bûne karhewî
Va hûn dibin dostê hina
Ku bo me nakin peyrewî

Carek dibê: Hûn bidne pey
Wan serekê nêzî Xweda
Ku didin pey van kesa
Em dûr dimênin ji keda

Carek dibê: Em jî divin
Hûn pir bikin doz û xebat

Dijmin li cîhanê pir in
Nahêlin hûn bighên welat

Carek dibê: Pir dehkerê
Mestir ji yê Kurdan hene
Çaxê ku tev çûne serî
Em bo we jî kar bendene

Carek dibê: Kurd ne l' hev in
Ma ka ezê kê bigirim
Çaxê ku hûn tev bibne yek
Va ez ji bo we li vir im

Rûs xurt e, em qels in li ber
Tiştê ku bêjî her ew e
Kes jê re nabêjî bira
Şaştî tu bêjî ne ew e

Ya rast ew e guhdar bibe
Lê tu j' Kurdan biz nebe

Pêça xwe neghore ji me
Mêr be ji me dil zîz nebe

Çar dewletê dijmin hene
Axê me Kurdan par dikin
Kî ya ji wan tê ber te ve
Rûsa ji Kurd bêzar dikin

Wisa ji wan gelkî hene
Lê Kurd hejar û reben in
Hûn tev li wan kêfê dikin
Hûn tev bi Kurdan dikenin

Kûba û Vêtnam çi kirin?
Rûs bo ewan bû zirx û post
Efxaniyan çi kiribû
Rûs ketye pêş wan bost bi bost

Lewra welatê wan heye
Sînor û navê wan hebû

Xwestin ku bibne karhewî
Rûsya ji bo wan pale bû

Em sînor û dewlet in
Rûs kengî sînor çêdikî
Kengî ji axê dijmina
Perçekî bo Kurd jêdikî

Rûsya divê dewlet hemî
Çêkin rêzanek şûrevî
Lê Kurd ji wan cuda nebin
Sînor neçin bê wekhevî

Her dem em pesnê Rûs didin
Em dev tavêjin Ingilîs
Dijmin li Kurd zorê dikî
Rûsya xwe dernaxî ji lîs

Çaxê em pesnê Rûs didin
Ew dewletên sermayedar

Dostaniya Kurd hew divin
Bo me dibin zirz û neyar

Rûsya me nakin karhewî
Dibêjin Kurd çi nezan in
Xaçî me nabênin ji xwe
Dibêjin Kurd misilman in

Ne dijminê Rûsa me ez
Lê, ez nekêm û kole me
Xwîna xwe dirêjim ji laş
Serbestîxwaz im bixwe me

Lînîn rêzanek darvekir
Gelkî rêzanek paqij e
Lê, Rûs li pey naçî ji dil
Her bo belengaza gij e

Ê ku li Roava dijîn
Ez ne neyarê wa me jî

Bo wan xwe nabênim benî
Bo min heye hiş û mejî

Rêzanek wan jî baş heye
Lê, ew jî pê nakin ji dil
Ew jî bi dijmin nan dixwin
Kurd li dilê wa nabî kul

Ev dewletê misilman in?!
Bê ol in, alî hev dikin?
Kes navê Kurd aza bibî
Her dem ji Kurdan dil rik in

Ê ku me Kurdan hûr dikin
Ê wan ji mala radikin
Rûsya dibî dostê ewan
Hevdû bi tişta şadikin

Rûsya dibî dostê kesê?
Gelkî bi mewdan û Newaz

Kû Kurd dibin dostê hina
Rûsya dibê: Bûne beraz

Ê têr ku cilkê çêdikî
Dibên: Te pîroz li xwe kir
Ê jar ku cilkê li xwe kî
Dibêjin: Te'j ku peyde kir?!

Em hew devtavêjin kesî
Pesnê kesî em hew didin
Her haştîxwazê rast em in
Pesnê me êdî pir bibin

Hey Kurd li ser bextê we bî
Tiştê mi got qey derew in
Serbestî endîşê bikin
Ma qey hemî hûn di xew in

Hey Hind û hey Islam û Çîn
Hey serwerên çax û dema

Hey Rûs û Elman û Firing
Ma qey mirovahî nema

Tiştê li gor vîna we bî
Gelkî li dûv hûn dibezin
Tiştê ku ne l' gorî we bî
Hin xwe ji ber wê didizin

Ev dewletê bê bend bi nav
Mîna ker û kora ne tev
Guh ji recala dibirin
Rastîkê nabêjin bi dev

Her dewletê îro hebin
Tişta bikin di çaxê xwe de
Nespêrin ê piştî xwe re
Çi baş bi ew bo we ked e

Hûn tev dizanin Kurd kî ne?
Baweriyê zû pê bikin

Hûnê bi vê serseriyê
Bo van gelê cîhan çi kin?

Ê ku li Kurd ferman dikin
Pir zorker û dil agir in
Ger hûn bi rastî bin mirov
Destê ewan hûn nagirin

Destên me Kurdan bigirin
Rabûr dê pesnê we bidî
Sitemkara nekin destik
Qencî nemaye qey gidî

Guh ji recala nebirin
Hûn jî recalê wek me bûn
Zû mêjiwê Kurd nas bikin
Rabûr û şopê me hebûn

Her filehê di nav me de
Mafê wa jî dighê ewan

Der vî welatî em yek in
Em hew dibin rengê kewan

Nema zanim çi bêjim ez
Dirêjî tu kedê nakî
Kesek nîne belakî, vê
Kesek nîne bi vê bakî

Hewara min li cîhanê
Li serdar û li bin dara
Me Kurdan jî bikin aza
Bibin guhdar li ser jara.

***

## Newroz

Gul hat û hûr hûr dikenî
Nêrgiz ji nişka hilçenî
Çûkan wekî sazan jenî
Ordek di miskê têr kenî
Kotir dihat por şikinî
Keçkê Silîv û Erxenî
Xemla li ser jor û binî
Winda dikir sîng û zenî
Por û mil û çeng û enî
Tev bazin û qol û benî

Kî hat mizgînek dida
Got: Bûye Newroz ezbenî

Bihar gerî mafûr bi reng
Çûk û çivîk rabûn bi deng
Dar û giya tev bûne şeng
Hatin sema her kêm û leng
Rabû ji hasin kîl û zeng

Gul ku miha pêçane çeng

Wertîn ji ber şêr û piling

Va tên bi lez qaz û quling

Kêfe dikin ev top û teng

Esman kirin rengê piring

Hemyan digot: Newroz bijî

Rabin bilez va bû dereng

Şêr tên li çola pal didin

Mest in piling hew pal didin

Nesrîn û beybûn xal didin

Mizgîn bi Restem Zal didin

Ê dil ne xweş hew nal didin

Govend li pey hev qal didin

Bêşê wekî her sal didin

Pêçê ji can û mal didin

Hew guh li ser min dal didin

Heyv û sitêrik jal didin

Hember Newrozê bûne rist

Mestê li jêrî al didin

Kom bûn sirişt û hem zerî

Qîz û ciwan û gulperî

Tanc û gulacê serserî

Gel hev dikin xweş berberî

Awir didan wek xencerî

Ê ku bixwazî koçerî

Cîhan li ber bû bêderî

Ê dezgevan hasinkerî

Her çêdikin ew tencerî

Bo xwarina yên perwerî

Malbat û êl tev hatine

Da ku Newroz kin xweserî

Vala kirin bajar û gund

Tev derketin palê bilind

Ji vir heta Îran û Hind

Seyrê dikin şalûl û kund

Leklek diçin xatûn û rind

Ev pîrpizêk û pîrepind

Tiştê dirêj û hem kulind

Tiştek nema bin ax û wind

Tevde dihatin ber bi xund

Çûn ber cihê dar û sifind

Qîr dan bi ber Kawa ve çûn

Hildan ji bo Newrozê find

Ba û zever çû, hat xweşî

Tarî nema çêbû geşî

Rohnî ketin şûna reşî

Bihar bi kêf hat beşişî

Xeftan dirêj peyde kişî

Xişrê giran pir jê xuşî

Bêhna Buhiştê hilweşî

Hûr hûr li qadê mişmişî

Bû nerm û hûr û pişpişî

Darê hinar û mişmişî

Kulîlk û tirhik dane der

Hatin Newrozê bê hişî

Şîv û newal û çal û erx

Tev bûn dewar û kehr û berx

Xwîna ewan tev kirne merx

Rêl û devî talan û derx

Newroz kirin bazar û nesx

Perwa kirin gilwaz û cerx

Şahan teva anîne tenx

Rêzbûn li hawîr bûne çerx

Tev ketne pişt polat û zirx

Nûka dibên: Biskê xwe derx

Tîrê Newrozê qurijîn

Li ser cîhan gul bûne perx.

***

# Hey gelê min

Hey gelê min tu nizanî ev Newroz bona çiye?
Ew çi re mest û hejar e bê hewar û xwedî ye
Min bi vî hawê gelê Kurd kes li cîhanê nedî
Ku ji dost û dijminê xwe hew dikin şerm û fedî
Ew ji bo hevdû neyar in, dil bi kîn û keser in
Lê ji bo dijmin dilovan, bê dev û zar û per in
Ew di gel pismam û apa her dikin qayîş û bend
Lê neyarê Kurd li cem wa her dibî şêrîn û qend
Ew bi çil sala dikî şer, kuştin û hem berberî
Da bidin pesna ji wî re çend mirovên serserî
Çil û neh Newroz bihûrîn bi dizî û heşkerî
Hê ji nav perçê me Kurdan ranebû ev berberî
Çi Roava, Rohilat in, ev çi rast û çi çep in
Ev çi kom û rişt û par in, ev çi qîr û çeplep in
Gelkî Newroz bo me şerm e tevlî ku em ne yek in
Em bi yek navî ne, rabûn her û her ew belek in
Ev çi mala zarûzêç in bê xudan û sermiyan

Ev çi bûk û qîz û xort in, ne li pey bav û diyan

Ev çi êl û bend û Partî, ev çi qend û axe ne

Ev çi kewt û komelê pir ê ne dilxwazê xwe ne

Ev çi anc û xan û man in, ev çi tevdêra giran

Ev çi derwaz û derî ne, bê kilît û dergevan

Ev çi gamêş û dewar in, bê şevîndar û şivan

Ev çi garan û kerî ne, man li ber pencê guran

Ev çi xatûn û zerî ne, bê serok û vêvirî

Ev çi talan û devî ne, kî dibênî dibirî

Ev çi gencê bê xwedî ne, dijmina ew dibirin

Ev çi posat û livîn in, bê kebanî li virin

Ev çi qîrîn û hewar in, bo çi hevdû dikujin

Ev çi top û mencenîq in, ser çiya toz û mij in

Ev çi bûkê mêrmirî ne, bûne bê govend û ken

Ev çi qûnaz û kelat in, bûne wêran û reben

Ev çi zozan û gelî ne, ev çi deştê pir fireh

Ev çi av û şirşî pan in, bê niyaz û bê gileh

Ev çi golê bê gemî ne, ev çi deryayê mezin

Ev çi kendal û şihar in, çi gul û dar û rez in

Ev çi rûbar û çiya ne, ev çi sîpanê bilind

Ev çi bajar û welat in, çi cih û bêlan û gund
Ev çi Wan û Ûrmiya ne, ev çi Kermanşah û Lor
Ev çi Bedlîs û Hekar in, ev çi Qers û Helekor
Ev çi Kerkûk û Şehirzor, ev çi Şingal û Duhok
Ev çi Efrîn û Nisêbîn, cêz û gêrman û sitok
Ev çi Newrozê hejar in, çi çekê zingar biwî
Çi dibistan û sera ne, leşkerê bêkar biwî
Ev hemî yê kê ne? Kî ne pey Xwedê kê hiştine?
Kî neyarî ew revandin yan ewan hev kuştine
Tev bibin yek hey gelê Kurd ma gelo em çi kesin?
Ma kul û derdê me dît in, ta bi îro nebes in?
Kurd niha hişyar dibin, lê ew bi dil dûrî hev in
Du kesê rêber ji Kurdan her ji hevdû direvin
Yek li pey Lînîn û Mrkis, yek li pey Maw direwî
Hew li çehrê hev dinêrin, xwe dikin yar û hewî
Yek dibê: Ola xwe bigrin her limêja xwe bikin
Ma ji ola xwe bi wir de, dê bi cîhanê çi kin!
Yek dibê: Karê xwe bigrin, xwe neke dûrî neyar
Xwe di zindan û qula de, ne gerên mest û hejar
Ne wisa be, ne weha be, ne ji va be hey bira

Ji teva re xwe bisoj e xwe bike rengê çira
Tu bi Newrozê şiyar be, tu li şopa Kawa be
Dev ji Kurdistan ne berde her li ser soza xwe be
Her wekî Kawa ti hilde pêtiya ala welat
Da tu Newrozê azakî li hemî war û kelat
Sond bi vê Newroz û cejnê ez li pey Kurdan herim
Ta li cîhanê bimînim dev ji Kurdan nagerim.

***

## Kurdê li Sûrî Kurdê Cizîrê

Em Kurd û ereb ê nêv Cizîrê
Tevde xizanin bê kar û qad in
Ew erebê dûr ger bên Cizîrê
Em tucarî qada xwe bernadin

Aşûr û Ermen Suryanî zehf in
Çima nadin wa axa Cizîrê
Ê tîr û dagir qadê didin wa
Ji bo ku çêkin pevçûn û qîrê

Be'sî dixwazin em Kurd û Ereb
Hevdû serjêkin ew rûnin ser text
Em du bira ne, kuştin çênebî
Em dê hember Be's bidin hevdû bext

Ev birçîkirin mal herifandin
Ev talankirin girtin û lêdan

Kurd pê bûn hişyar rihê namûsê

Xwêdan digirtin teva xwe hildan

Kurdê Dirbêsî yê Serêkanî

Kurdê Amûdê yê Qamişlokê

Ê Tirbesipî Kurdê Endîwer

Tev kaşo bênin ji bona gokê

Goka Kurdan e daket gasînê

Dijmin dixwazî derxî bi zorê

Hey golarê Kurd kaşokê lêxe

Da lingê dijmin hew bigê dorê

Bijîn ê dilxwaz ji Kurd û Ereb

Di nêv Sûrî de, di nêv cîhanê

Ê ku dixwazin welat ava bî

Nabin dilxwazê ceng û lêdanê.

***

# Çi çêbûye?!

Bizanin bê çi çêbûye, gelî Kurdên li cîhanê
Di vê roja xuyanî de, dehê heyva Hezîranê

Çikû van Be'siyên Îraq ji bajarê me yî Hewlêr
Ji Kurdan bîst mirovê baş, ewan kuştin bi dar û kêr

Bi biryara kekê Mesûd, bi gotara birê Idrîs
Divê em Kurd bikin şînê, li hember van kesê pir pîs

Divê her sal di vê rojê heçî Kurd çêbikin şînê
Di bîr bînin evan şêran bikin doza evê xwînê

Bizanin kuştiyê Hewlêr, di berya we gelek kuştin
Ji ber vê kuştina îro di zindanan de hûn hiştin

Gelo ka kê wekî Seddam di cîhanê sitem rakir
Wekî wî kê di vê çaxê bi vê zora mezin bakir

Herê Seddam herê bê bav, ereb tevde ji te dûr in
Ereb ji her wekî Kurdan dibin zora te pir zûr in

Herê Ehmed herê bê bext herê Zehakê Tekrîtî
Bi zora hesin û agir li Bexdayê tu pir şîtî

Ti gavek der be cem Kawa, serî hilde wekî mêra
Xwe bigre gavekê hingî li ber çavên ciwamêra

Peyayê dergehê Rûsa sehê wan Be'siyên rûreş
Şivanê şehrê Tekrîtê tu rûniştî di burcê xweş

Di nîvê top û tenga de, diparêzin te bê kêrî
Were nêzî çiya îro bi rastî ger tu xweş mêrî

Tuwî Nazî tuwî faşist tu çavsor û sehê harî
Kurê Holak û Cengîz î, ji cîhanê fedîkarî

Gelo ma qey mirin nîne, dikim bawer tu bê dîn î
Tu ne li gorî Emerîka ye, tu ne li pey Rûs û hem Çîn î

Belê jîna te hindik ma, birê Seddam ji te'r mizgîn
Ji zora te dikê Kurdan ji nîvê xwe dirêjî xwîn

Ewê tola kurê Kurdan ji nîv çavên te derxînin
Ewê çend gotinên hêja ji te'r bêjin te l' berxînin

Gelek Kurd hatine kuştin bi destê yê wekî Seddam
Me dîtin zor û bindestî ji destê dijmina bê kam

Belê cîhan berî vêga xwe dest û berdî berdan bû
Ne wek vêga bi danişgeh bi axaftin bi rêzan bû

Di gel vê hîn kesê Be'sî dixwazin ku bikin winda
Şewat û zor û talana li bajar û der û gunda

Ji te'r mizgîn keko Seddam tu hew karî veşêrî van
Bizane xweş tu tê kuştin heger "na" tê bibî gavan

Sedê wek te bi gorî bin ji bo van kuştiyên Hewlêr
Çi tiştê pîs bibêjin te dilê min her xwe nakî têr

Çi heyfa wan ciwamêra çi heyfa wan kesê hêja
Ku hatin girtin û kuştin bi destê van ker û gêja

Ji Hewlêr û Silêmanî Keleh Diz û ji Barzan
Evîn karwanê azadî ji Kurdan re li cîhan

Ji her alî welatê Kurd ji pêşî em bi karwan in
Heçî ev kuştiyê Îraq di îro de li pey wan in

Ji Dêrsim, Agirî û Amed, ji Îran û Mehabatê
Gelek karwan bihorîne heta Barzan û Rayatê

Didim qîra li ser vana bi nalîna ji vê dûrê
Ezê şîna teva deynim bi nalîn û bi tembûrê

Bi govend û bi dîlanê emê pesnê we pir bêjin
Bi qîr û zar û giryanê, emê canê xwe bibrêjin

Emê gurzê gula deynin li ser gor û cihê wana
Emê topa bibarînin li ser goh û der û bana

Emê wan kuştiyê dara di salê nû di bîr bînin
Heçî Kurdê xwedî soz in, hemî rengê Mem û Zîn in

Hezar qencî li gora we di rengê berf û baranê
Di çaxê pênc limêja de, dema rabûn û razanê

Bi hêvî me ku Barzanî kul û derdê me dermankî
Xuha Leyla û Kurdistan ji wê janê bi berdankî

Bijîn pêşmergeyê Kurdan bijî Barzanî bavê Kurd
Ewê tola we bistînin, ewê rabin bi navê kurd.

***

## De jaro ezê bimrim

De jaro ezê bimrim wekî her kesê ku çû
Belê ez nizanim ka bi rûmet bi xizanî
Hebin ger hinek zaro wê bigrîn du-sê
Bi qîr û bi zarîna ewê deng bibin banî
Kesê ku bibî ageh divê tiştekî bêjî
Çi qencî çi neqencî, li gorî ku ew zanî
Heçî ku ne dijmin bî, dibê: Wey gidî bavo
Çi heyfa mirovê baş, mixabin li wî canî
Heçî ku ne dilxwaz e, dibêjin: Bere bimrî
Çi başî ewî kirye  ji bo me li cîhanê
Hinê zû mi tazî kin, cilê min ji min deynin
Gelo ew fedî çû ku? Dema sax û guhdanî
Ewê germ bikin avê, ewê textekî deynin
Ji bo şûştina paşî, bi axî bi heyranî
Ewê qerqera bênin, me têxin di nêv wa de
Me rakin bi darbestê, herê can tu wêran î
Ewê kortekê çêkin, me deynin di nêv wê de

Tijîkin ji wê axê, bi jar î, bi dêran î
Di piştî diçin malê, dikin xweş dilê saxa
Ji bo can û cergê wa, xwe bigrin bi mêran î
Di wa rojê nû bimrim, li min wê bikin pirsê
Di piştî du- sê roja, nema kes diçî xanî
Heta çendekî halo civata ewê deynin
Heçî sax dibin dilxweş, bi zêr û bi şêran î
Belê ewê ji bîr kin, ewê ku dibin axê
Nema kes dibê: Çû ku? Nema kes dibê: Kanî?
Di hingî kedê nakî, çi dost û çi dijmin bî
Tenê qenciya min kir, xuyaye bi nîşanî
Dilê keskî nahêlim, di çaxê ku karim ez
Divê ez dila xweş kim, bi dest û bi ezmanî
Xwezî xweş mi zanîba, di piştî dema bimrim
Bidîta çi dostê xwe, bi çav û bi serdanî
Bese hey çi bêjim ez, Xwedê ez wiha da me
Niha piştî mergê bî, Xweda ew ji mir danî.

***

## Şoreşa Geliyê Zîlan

Gelyê Zîlan bilind e, gelî di bin de kûr in
Gelyê Zîlan bi deng e, eger hûn tê re bûrin

Tiştê di wir de çêbû, ji Kurdan ve xuya ye
Zor û şewat û kuştin tev ji destê tirka ye

Tirka ew kirye dojeh linik me bûye Buhişt
Ava wir bûye derman, axa wir bûye nivişt

Li vî warî çi çêbû, emê ji bo we bêjin
Sed ronikê ji xwînê ji çav û dil birêjin

Piştî cenga Ararat tirk hatin bûne agir
Wan li Kurdan dinêrî bi çavên hov û gawir

Agir berdane mala xwedî ji wan kirin der

Kî bigirta dikuştin bi şûr û agir û ber

Vala kirin du sed gund, ji gundê nêv Ararat
Xanî hemî disotin çiya dikirne berbat

Kurdê wan tevde girtin anîne Gelyê Zîla
Tirk bûne kom li hawîr mîna beraz û fîla

Deh hezar Kurd kirin kom da bisojin bi yek car
Bû qîreqîr û nalîn, bû hewar û zarezar

Kî guh didî hawarê, neyar hemû beraz in
Nîne guneh li cem wa, nizanin qîr û gazin

Ne guh didane xorta, ne guh didane qîza
Ne guh didane kala, ne guh didane zîza

Ne guh didane mêra, ne guh didan piçûkan
Ne guh didane şenga, ne guh didane bûkan

Dilê wa bûye pola, tifû li van neyaran
Çilo qîzik disotin, tev bazin û guharan

Balafirê Ataturk êrîş kirin bi kînê
Behrûd û ber weşandin, agir digirte xwînê

Emê heyfa we qenca, ji dijmina hilînin
Emê warê we yî xweş di Kurdistan bibînin

Cihê laşê we têde emê carek aza kin
Mizgîn ji bo we hingî li ser gora we bakin

Bijîn laşê we pîroz, bijî navê we her dem
Hûn goriya welat in, bi heyrana we bin em.

***

## Gazin

Qey min çikir hey felekê
Te ez kirim vê kelekê
Vê kot û xefk  û xelekê
    Ez bûme bendewarê gul

Ez mam li cihkî gelkî dûr
Lew her dikim nalîn û zûr
Hatin bi ser min de, bi çûr
    Êş û fena hem derd û kul

Dilber ji min winda ye her
Nav min û wê bûne çeper
Ez her dikim ax û keser
    Min têr nedî ew mord û vil

Bakir mi got: Hey dilberê
Ka ew dem û çaxê berê

Ez destedawê kemberê

Bo çi ji min tu maye sil

Peyvî bi min re ew bi zirt

Ji tirsa min xwêdan digirt

Tarî dihat rohnî vemirt

Cênî ku anî bûye şil

Min go: Mi kes wek te nedî

Hew çend bi teşq û hem fedî

Lew tu li min nabî xwedî

Ne wek te karim ez bi dil

Min dî dihat û dikenî

Geş dikirin birh û zenî

Digot: Were vir ezbenî

Ez çûm mi mil gihande mil

Dîsa ji wir ew bû der e

Bi lez dibûm pîr û ser e

Ji hev ketin her çeker e

Li min girê kekê bilbil

Wan awirê çavên belek

Temberî û biskê xelek

Ji hiş birim demkê gelek

Pir kuştine çavên bi kil

Gelo hêta kengî ez ê

Bigrîm li pey vê helezê

Ew sêv nema tê ber gezê

Divê ez hew bikim xulxul.

***

# Rabûrî

Netewa bo te di rabûrê hebû
Nav û deng wek 'ereb û tirk û ecem
Leşker û hêz û miferdî çûne ku
Kê sitandin ji te ew şûr û kelem
Ez dinêrim li te, lê em sitû xwar
Bi fedî me ji dûhatan mane em
Ger tu winda yî niha axîn dikim
Lê bi sond wê vegerî bona te dem
Em di rabûrê de kevn in tu biner
Kê berî me peyde kir hespê bi gem
Ê gemê bir kopê Cûdî her em in
Dicle zanî jê bipirse hey cîhan
Kî berî me têde ajotin belem
Em ji Hind û Ewrupî ne tu bizan
Em jî Arî ne, bi soyîn û bi lem
Kî dihat û dil bijand axa welat
Em li ber lingê ewan bûne kelem

Pir bi xwînê hate avdan xakê kurd

Dijminê me pir li ser wê bûne çem

Xurcezîna me yî dorgir ti bi zêr

Nêvî çûye nêviyê dî ma di cem.

***

# Kurdistan war û geh e

Kurdistan war û gehê dalan û çal û erxa
Hey kurdo xweş mêzekin bîlan û çax û kerxa
Her dem tê ber çav û geh barîna kehr û berxa
Çavên ku tênin xwarê ser katê dar û terxa
Xweza xwe bi hingê tênim go tên peşkê baranê

Çaxê ku ezman şîn e cîhan xweş tava heyv e
Tê dengê çûkên rengîn, alê darê vêkeve
Wek berfê tên ber çava kulîlkê van behîv e
Kêfa xweş têr jê nîne ku tê dengê garanê

Bedlîs û Mûş û Amed werê xatûn û paşa
Refref tên qaz û qumrî tê dengê avê aşa
Rengê zinîrê zîv î pela tavêjin kaşa
Kî karî pesna bêjî bo vê kêf û seyranê

Bajar bûkê nû xemlîn hawîr gulka guldar in
Da tu goh û sarinc mêrg û dehl û rûbar in

Kurdê şehr û bajara xwedî bang û bazar in

Kurdê deşt û pehnava çavnêrê îş û kar in

Xwezya ez çûba deştê çaxê das û dêranê.

***

## Welat

Şabaş Xweda navê welat bûye xuyanî
Pê ageh bûn goya bitin gelê biyanî
Pêşmergan li ser çiya tifing hilanî
Şah Mustefa mavê me xwest rind û hisan î
Dijmin bi lez rabû, bikin qîma xwe nanî
Nû pir vebûn ceng û şoreş xwîn bûye kanî
Çûbûne gorê çi mêr in kes pê nizanî
Hingî li Kurdan bû xuya pesin bi vanî
Me nedî bira wan dihat şer û xizan î
Li ber me kinarê welat serê xwe danî
Ji guh xwe avêtin teva çaxê ciwan î
Li ser çi civat dane hev kom û civanî
Ceng û şoreş li ser welat dibû giran î
Xwedê ji esman ji me re mêzîn deranî
Barê neyar û dijminan li ser me danî
Hev de seba ya Mustefa vî qehreman î.

# Kurdo zû rabe

Kurdo zû rabe îro Newroz e
Roja ku Kawa rakir bahoz e
Wek bavê xwe hûn tev rabin kêfê
Cejna Kurdistan çêkin pîroz e

Bakî Roava pir fîzefîz e
Bû çi jin tên fer Adara qîz e
Bi keser Kurdistan bû govend e
Çol û der tev bû cihanek zêr e

Leşker pir hatin bo me bizrînê
Çûk hatin ku gedan bi hilbînê
Hûr û gir qîz hatin geşt û kêfê
Roava rûder per û yezînê

Xortê Kurdistanê tev hûn hilin
Qîzên Kurdistanê çava kildin
Fistanên rengîn û geş li xwe kin

Berya bibhûrin nêv mêrga şel bin

Govenda dênin sed reng û hawe
Sed pesna bêjin bo rindê Kawe
Dîloka bêjin ser vî beranî
Barzanî xweşmêr, kawa xweş law e

Bîr bînin vê cejnê, pesna bêjin
Dengan xweş hildin cana bibêjin
Nû sax kin vê roj, şop û nîşanan
Bo Kurdistanê her dem xwînrêj in.

***

# Textê mezin

Bûka li ser textê mezin xwedya cil û textê biha
Paldaye ser naz balgeyan, dengê bira naçî giha

Bûkê bira bûne şiyar, haya te rindê jê hebî
Ew dergehê bend û kilît ku li ber te wê nû vebî

Sondê bi Yezdan her dixwim, ez dê te hey rûdar bikim
Bo kuştin û bo sotinan şev û rojan dê kar bikim

Tirsa me nîn in, ji kuştin ew nizmî û kêmasî ye
Ez dê bikim bo dilmirê xap û rîp û pêxwasî ye

Hey wax çilo xwşka me bê dijin dibê te li ber çiya
Ger ez ji bo wê dê nekin êdî bikê kanî kiye?

Karê neyaran her ev e, her ew mirov li sar dikin
Dozkir dikê qîr û hewar, her ew şahî nû kar dir in

Xew nîne bo çavên reben dil her diman dozê dikê
Nava me ew rengê Kûrye nalîn wekî mozê dikê

Rohnî ji ber çavên me çûn, ku yê nas dikim ez resma
Ev laş nema tê hûrkirin bi gûz û şûr û hestima

Dijîm berî ku zorê bikî kêfa me zend nûqel in
Bo gotin û bo kuştinê çavên berê bûkê kil in

Mane mirin her dem yek e, sondê dixwim nabe didû
Ber em doz û rêke herin da hin bibêjin wê  ked û..

Dijmin bila bawer nekî, yara wî ku bû xertî ye
Jîna mirovê bi zorê, bakir: Dem her kinetî ye

Her dem bike rohnî li me dijîn bila nû bîne kor
Da em di qadê çêbikin wê rastiya şahê li jor.

***

# Neyar wekî mar e

Neyar bo Kurd wekî mar e
Heçî şahê di Adar e
Dikî başqe ziman û dil
Rehved û mar û şarar e

Heçî benat, êrîş şet e
Di me'r hev de bi du teşt e
Ji bil wan ev derew zanim
Eger cîhan bibî meşt e

Bizanin ew dil û zar in
Bi herdûka heyîndar in
Gelo yê lîn di cîhanê
Li wan em jê evîn ar in

Heçî goşt û heçî xwîn e
Wekî rengê zer û şîn e
Te herdûkan di serhawe

Ber gerdena xwe derîne

Mirov jê tevlihev bûne
Ji rengê pêşiyan çûne
Bav û dê ji hev dûr in
Bi sed bejin û sed rû ne

Belê nû dil ciwan nabî
Teha cîhan ji cî rabî
Ji bîr nakê zimanê xwe
Çi bi rî bî çi ya şah bî

Heye dil xwe ji bîrakî
Bezak dê ji xwe riyakî
Çaxê nû te diyalîkî
Hewarek wê li balakî

Ewê gelkî xwe û sidîn in
Ji bo zarê xwe bistînin
Heta qîzik bibin pê da

Mirov kengî avis tînin

Dilê Kurdan demek zara
Li ber xap û keç û saza
Welat berdan wekî dîna
Ketin goh û qul û gaza

Gelek tiştên nexweş xwarin
Nizanin ku ne şêrîn e
Di çaxê ku ji xew rabûn
Xwe dîtin wa li ber mar in

Ji tirsa dê xwe razandin
Gelek rondik dibarandin
Ji hev re werdozê gotin
Neyar em tevde xapandin

Hinek revyan wekî Kawa
Zeha jehra xwe berda wa
Di nav laşê me raneda

Reha bûn hin ji xweş lawa

Hemû wek har û gêja bûn
Çi wan pûn e hejara bûn
Bi demê xwe biyan bibûn
Di nêv gend û qirêja bûn

Kirin dîsa herin mala
Didîtin mar li her ala
Dihatin wa bi qerpênî
Ji tirsa tev ketin çala

Ewan Kurdê wek febîta
Tevan rahişte berçîta
Serê maran gelek jêbûn
Li wan çala wek qebîna

Di çaxê Kurd weha dîtin
Doza benî çet û şît in
Ji nû girtin mirovên qenc

Ne marê ku we ew dîtin

Bi vê demê hinek bûn şaş
Çilo mar bû mirovek baş
Hina şerkir hinek sedîn
Evê hişte em bimînin paş

Belê dîtin birîn kûr e
Zimanê wan ji hev dûr e
Zimanê Kurd ji nêrdan e
Zimanê wan ji yê mûr e

Ji nû Kurdan xwe kir kar e
dizanin ku bez neçar e
dijminê mirov her ew in
Zeha ye çêliyê mar e

Nizanî ku çilo bakî
Li Kurdan re nema çakî
Ewê nûka xap û zorê

Ji bo Kurdan ji bin rakî

Niha yasa neyar bû mar
Wekî pîşê me jê da dar
Di nav Kurd û neyar ceng e
Heta bû yazdehê Adar

Belê cenga me qet nakî
Heta dijmin hemû rabî
Heta ev zar û dil bû yek
Seraser Kurd cuda nabî

Şerê mar e jehir mar e
Ser û bin bikin Adar e
Heta ev dem nebî ew dem
Gelê kurdî dibin bar e.

***

## Cotkar

Hey cotkar hey bavê min
Cotkar axa me kêla
Bi du ga yan du çêla
Çêtir ji wan deh sêla
Ji qîr û şêl e bêla
Hey karker hey çavên min
Karker hatin wek şêra
Li nav bend û şikêra
Co vekirin bi bêra
Av berdan ser siwêra
Hey cotkar hey gavê min
Ew gîsinê tey zêr e
Gelkî bi xêr û bêr e
Bi palûta û gêr e
Ê birçî dikî têr e
Hey karker gulavê min
Bi saya tevrik û das

Karker tev bûne gernas

Tevde hevdû kirin nas

Ewê serqot û pêxwas

  Hey cotkar diravê min

Li şûna tov dirjênî

Werz û xerza diçênî

Şax û terxa datênî

Ber û dana hiltênî

  Hey karker hinavê min

Arvan bi têr û şala

Li nav kaş û kendala

Dibî aş ew ji mala

Dihêrî bo mindala

  Guhdarê ser davê min.

***

## Kur û keçên dilawer

Kur û keçên dilawer Zariwên Kurdistanê
Bibin guhdar li ser min Ê diçin tîpistanê

Dakev nîvê biha şar Bikev çivê şivokê
Hûrik û qîr û qafa Bikir bi bar û hokê

Di gel kesê firotar Here hundir hetkanê
Jê bikire li ser hev Firax û tiştê hanê

Yek hûçikê ji hasin Bo xîpa ser dilopî
Yek şûşeya ji xwîna Ahûsika Silopî

Çend xîpikê ji komer Demetperê pêncî pel
Çend gurzikê gulê lek Wek sosin û gul nefel

Gel miştika lastîkî Gel şûşeka çivîtê
Çinatûlkê bi zînqor Tev taxim û kilîtê

Gel rastika xîzdar e    Gel zîzoka xîzxelek
Gel pîveka sêgoşe    Gel xîpika reng belek

Gel pêlavek caw sitûr    Du goreyê dev gulik
Gel pîveka girover    Tevlî kom û berçavik

Tev kinmil û derpê kin    Pê bike bezhewînê
Destek û şal û şapik    Bo êrîş û ayînê

Gewrebenda serîpan    Porwinde ya giya zil
Ser sîwan bo zivistan    Da tu nebî şil û pil

Gelşeh û nîv weynekê    Tev qarîşa bi bizmik
Qutîkata kar bixwe    Tev gurîşa bi bizmik

Cawkêlî xwe bipos e    Şevpeyanê şiyar be
Paqij û pak û nişmî    Bo xwendinê likar be

Çav û ser û piyê xwe    Bişo bi av û sipgûn
Bixwerên tu dirana    bi pirçe û bi hevgûn

Nû ziwake riwê xwe
Bi dismala ji gernêş
Li nîv mila girêde
Ti bazbenda hevirmêş

Bi ser sîngê de berde
wê sînbera reng axî
Bide ber sitûwê xwe
Ber sitûka du taxî

Piyanek şîr û hinguv
Di gel nanê bi xweza
Libek hêka biraştî
Ji cem dayê bixwaze

Piştî tu bûye nîvtêr
Bişo diran û dest e
Peyde xwazer bixwaze
ji nû kar be helest e

Dahêj nîvê berîkê
Pêkirên hûrik û girs
Bigir destê hevala
Li bengê wan bike pirs

Li hewgavê bibin kom
Li bezxurtê siwar bin
Di gêrzîna de rûnin
Bê deng û bê hewar bin

Li hinda xwendexanê
Li dûv hevdû peya bin
Bi lez hingî nebûrin
Dema zû rev xuya bin

Herin ber xwendexanê    Bi kêf û naz û şahî
Rawestin çend kêlîka    Li nîvê bendegahî

Serê xîpê reveş ke    Guvaşekê werîne
Tu qutiyek ji têla    Pelê lastîkî bîne

Kulorek lazika cam    Tîperê xwe girêde
Şil bike wan yeka yek    Wan têlikê xwe lê de

Peyde herin bibin rêz    Li hember fêrexwenda
Bikin mûçik li hawîr    Baz bidin çende çenda

Peyde herin cihê xwe    Rûnin li ser dephola
Bi serbestî û şîtî    Ne gewşek û şepola

Seyda ku hat ji wêde    Rabin bi lez ji ber wî
Bixwîn hîswerd û ristik    Pesna bidin li ser wî

Biner li peyvê seyda    Bixîzîne li rûpel
Di oda xwe tu pêşî    Bide çavîş û sergel

Di nîv şax û cih û nof
Bike qîrîn û qebqeb
Bila nîşan û durvê
Deynin li rast û hem çep

Bizavê xwe rewa ke
Bibe tenha û pêşber
Di nav komê hevala
Bibe hozan û serwer

Meyzê li textedozê
Bi hişgir û bi ayîn
Li ferş û hem dewaşê
Tu deyne xîzê narîn

Dest hilava hilînin
Dema xwe jê re daxin
Gul û beybûn û sosin
Li bin ala xwe raxin

Ku şeş fêrkat bihûrîn
Derkevin jêrî alê
Hîsdirêna bi kurdî
Bêje bi nalenalê

Di Kurdistana nişmî
Bibe şalûl û bilbil
Pesnê welat û bava
Bêje bi hêwr û xulxul

Herin saxdariwa gund
Tarevêna werîne
Avsîxîk û libê baş
Ji bona xwe derîne

Dema tu bûye tawî
Bozke tu van ciyê ha
Lib û qotîk û hetwan
Wê hilînin kul û ta

Çaxê tu hatî malê
Li pey bav û diya be
Li tîpistanê her dem
Bi sernermî xuya be

Wê zor û taw û rengê
Bi avê de neberde
Dema te yî nehatî
Tê de bibe siparde.

***

## Newroz

Cejna we pîroz û xweşî
Cergê we mîroz û geşî
Dûr bî ji we zor û reşî
Gorî bibim bo vî beşî

Hey xwende yê zarê kevin
Hûn tev bi yek zar û dev in
Ger hûn bivin an hûn nevin
Hûn tevde Kurd in ji hev in

Ev gel civîn a pêşî ye
Sûrî di vî warî diye
Civîn ji cûrê kurdî ye
Bo xwendevana behrî ye

Hey xwendevanê rû şemal
Xort û keçê şêrîn delal

Hûn tev bi kêf hatin ji mal

Hey zariwên Gurgîn û Zal

Hûn tevde hatin sersera

Ji gund û bajar û dera

Ser van şihar û mexera

Derxin ji dil van kesera

Vaye mêvanek hatiye

Hûn tev dizanin bê kî ye?!

Tiştê dixwazî ew çiye?

Bo kurdenasî ew tî ye

Mirovek zana û dilêr

Bo xwendina kurdî bi kêr

Navê wî binvîsin bi zêr

Ser eniya heyv û sitêr

Hat ji welatê Sofyetî

Ew dewleta pir pêşketî

Bo vî gelê jar û ketî
Da nas bikin ên serketî

Hey kurdezanê me'y li vir
Avakerên ax û kevir
Hey êş hilênê dil zivir
Sazendeyê reng û bivir

Hûn hatine bûne civat
Da çêbikin xîzê xebat
Pirtûk bila çêbin bi qat
Bo qîz û xortê dilşewat

Rûnin li ber av û siha
Bo jendina saz û ji ha
Pir kin hewar û giliha
Rêkin dîwarê her ciha

Dengê xwe hildin ber bi jor
Da fêr bibin ê lal û kor

Ê fêr nebî fêrkin bi zor
Bi zanatî da herî gor

Pirskin li hev serdan bikin
Êşê giyan derman bikin
Tiştê biha arzan bikin
Dil bi kulan bê jan bikin

Doza welat pir mezin e
Ji Kurd nekin pir gazin e
Hawîr me xefk û bazin e
Bo vî welatê sosin e

Her yek bi lingê xwe her in
Dost û hevala binerin
Ji kêmiyê wan vegerin
Hûn bi hevalan bi per in

Tevde xebatê bikne yek
Ger hûn dixwazin al û text

Ê hindik û yê kar gelek
Hem leşker û hêzê bi rext

Hin bi zarîn û hin bi çek
Tevde bidin hev soz û bext
Dûr kin ji xwe pîlan û dek
Pêş hev nekin azar û sext

Zû avekin hûn serxwebûn
Aza bikin Kurdê zebûn
Şop û nîşan tev berze bûn
Ji dest neyarê hêyzebûn

Ev serxwebûn naçî serî
Ta Kurd nebî rengê berî
Yek perçe û bend û kerî
Yek rêçik û şop û derî

Ev serxwebûn dara gul e
Her dem ji xwîna Kurd şil e

Bo Kurd hemî derdê dil e
Kurdê reben wek bilbil e

Kuştin tenê nabî xebat
Xwendin divê bona welat
Derman divê bona şewat
Dezgeh divê bona kelat

Karan li hevdû beş bikin
Hin zor û ceng û leş bikin
Hin xwendinê pir geş bikin
Derman li yê nexweş bikin

Hin kuştina dijwar bikin
Hin bê hişa hişyar bikin
Hin saz û ney serkar bikin
Hin îş û daz û kar bikin

Hey ristevan rista bibêj
Da Kurd bibin tev dilbirêj

Dil bibne şûştî ji qirêj

Ta ku neyar tev bibne gêj

Hey xwediyê saz û neya

Hûn venexwin keşk û meya

Hûn xwe nekin rengê keya

Hişyar bikin jar û peya

Hey xwendevan tu raneze

Der xwendinê her bibêje

Xwendin wekî bax û rez e

Tu bernedî yek bê gez e

Hey dar û êş tu rêberî

Bo mirinê tu l' ber derî

Derman bike jin û serî

Da Kurd nebin bend û kerî

Hey dazkerê text û bera

Tenha ne hûn koçk û sera

Ava bikin bona pera
Zana bikin hûn hişkera

Hey leşkerê zana û çîr
Xwîna te ye şewq û nedîr
Em te cuda nakin jibîr
Xort û keç û êşîr û pîr

Her yek ji van şûrek heye
Her şûrekî yek hawe ye
Her yek li ber şûrê xwe ye
Her yek ji bo Kurd pale ye

Xwezya mi her hûn xwende bin
Hûn pêşkevin her kêm nebin
Derd û kul û jan berze bin
Hûn sax bimînin her hebin.

***

## Nêçiyarê Kepez

Hey nêçiyarê Kepez xwedêkî bêjin çiye?
Ev şêrîna dilê min, hûn dizanin bê kî ye?

Ew yek ji kewtê we ye, wilo şeng û delal e
Nazik û merd û nerme, dilê min her li bal e

Yan ew gîsol û berx e, yan ew gula geya ye
Yan kewê nikil sor e, yan ordeka çema ye

Yan ew bûka gula ye, evîn bera bilbil e
Yan dermanê bi deng e, zû dibî derd û kul e

Qozeqera bi reng e, li ber hewr û bi sîsî
Yan şalûla çiya ye, li ser Cûdî dilîsî

Yan hevîrmişê b' peng e, bi qeytan û bi sîm e
Ji bo yek dîtina wê, bê çare û gilî me

Yan kembera ji zîv e, bi netrik û bi rêşî
Ya bazbend û nivişt e, zêr li ser bûne kêşî

Yan piyanek bi nîgar, çêbû bi destê Manî
Yan nêrgiz û binefş e, şîn bû di mêrg û kanî

Gelo yan ev perî ye, yan ji nifşê surişt e
Daketiye ji esman, hatiye nêv Buhişt e

Yan ew sêv û hinar e, li ber siha newalê
Nema zanim çi bêjim, di pesnê vê hevalê

Ew ne kar û ne berx e, mexel nabî di koza
Xwe dernaxî ji perdê, li hember naz û qoza

Ew ne gula giya ye, giya zûka dibî hişk
Şah û qiran û hempa, li ser dikin şer û pişk

Ew ne kew û ordek e, ew naçî nava sermê
Hem naçî nêv qeşayê, xwe nagirî di germê

Gîsola got: Me naskir, ya ku tu lê dipirsî
Ew a ku tu ji ber wê, bûye xizan û birsî

Xanim û şehneşîn e, ew ne ji nifşê me ye
Zana ye, hişgiran e, ew jî ji nifşê we ye

Ew a ku tu dibêjî, ne nêçiyar û pez e
Ew ne li vir diçêrî, ne gîsola Kepez e

Ew ji me naziktir e, ne çarpî û du sîm e
Kezî dirêj û sor e, bi xeftan û zêr kum e

Ew ne piyan û cam e, piyan li ber dinalî
Nîgar ji we re çêbûn, didî pesnê delal î

Perî û surişt dibêjin: Hene û spehî ne
Li me wek dil berat e, hê xweşiktir nedîne

Ne nêrgiz û binefş e, pelê wan têne xwarê
Kulîlk û şax û beybûn, ji ber dikin hewarê

Ew ne hinar û sêv e, ew bi lez têne xwarin
Hinar û sêv e çi şeng in, belê paşî ji dar in

Ew ne bûka gula ye, ku bilbil lê dixwênî
Dîna wê pir biha ye, nahêlî kes bibênî

Ne derman û ne toz e, derman li ber çi tişt e
Ew hineka dibî ar, ê din dibî Buhişt e

Çêtir ji qozeqer e, birhê wê qozeqer in
Şalûl bi rengê xwe ve, kengî li ber hember in

Netrik û zîv û rêşî, ne bazbend û kember
Nagihin şengiya wê, her pê re nabin hember

Lê ew zerke rind e, ne wek me lal û hov e
Dûrî ewê bi kêmî, ew bi hiş û mirov e

Keçek maqûl û şît e, xwestin qelen biha ye
Bi xwendin û bi zanîn, di nav qenca giha ye

Li cem hov û mirova gelkî bi nav û deng e
Ê mehra wê bixwzî, divê rabî bi ceng e

Heger tu wê dixwazî, wê bistîne ji dijmin
Bê şer ew nagihê te, ev e peyva min î kin.

***

## Dilo jaro

Dilo jaro heta sax im di yek gavê tu xweş nabî
Tu kovgîn î tu kuldar î, di cîhanê tu geş nabî

Xizan û berdîwar in, ez zebûn û kolê kola me
Wekî bilbil dinalim ez gîsolê goh û çola me

Gunehkar im hêvî nîne îşê min ax û nalîn e
Birîndar im bi sed derdî karê min baryad û şîn e

Kordîn im her wekî dîna biwîm bê kiş biwîm şeyda
Çi agir hate nava min çi derdek bû li min peyda

Xwezî ev can û gewdê min nehata rûkê cîhanê
Bibîma ax û gerz û toz nehata ser vê wêranê

Ziyan û renc û sûcê pir dil û can tevde kirne xwîn
Ji goman û ji kovana hişê min çû bi rast bûm dîn

Diya min çû xuha min çû ketin gor û cihê tarî
Heya cîhan dizanin tu jehirdarî wekî mar î

Bira û dost û bav û dê hemî pey hev de zû şandin
Delal û dilber û şêrîn ji ber çavan te revandin

Xwedî zêr û xwedî mewdan li ser piştê gelek rabûn
Ciwan û nazik û dilber li gasînê te pir şabûn

Gelek paşa dikin ferman li kom û gund û bajara
Ne kir hode ji xwedyê text û zêr û burc û tancara

Gelek xanê bilind çêbûn sera û odeyê banî
Bi hêwan û bi burc û taq hemî dergahê mîranî

Avaker çûn ji cîhanê di şûna hemî hiştin
Heriftin pir hinek zaro di şûna wan de rûniştin

Xizan û dewlemend û patîşah û nazik û serwer
Hemî çûn pey xwe hiştin wan dirav û zêr û zîv û per

Gelo Xusro li ku maye bi Kurdê berze bû xaqan
Ne Nemrûd û ne Xusro ma ne Firewn û di gel Haman

Hero sê leşkerê Hêzdan dikevne bin perê vînê
Hine dimrin hinek nûka ji zikmakê xwe tên jînê

Ji sîng û piştê dê, bava hinek têne rijandin ew
Li hawê ku Xwedê danî di hinga tê meyandin ew

Gelek beglik gelek dewlet di gel paşê xwe winda bûn
Di şûna wan hinek pîstir û ya çêtir ji wan rabûn

Gelek çavreş dibin winda ji nav kom û hevalê xwe
Li ser pişta xwe nahêlî neyar û hem delalê xwe

Tu axa bî tu paşa bî çi qenc û yan çi hawa bî
Di çaxê ku mirin bê te ji caw pêve bi xwe'r nabî

Heger derman dikî hode sûma Luqman gelek fêr bû
Ku mêranî bikî hode kurê Zalê gelek mêr bû

Ku mal û zêr bikin hode wekî Xusro kî ye maldar
Cîhangîrî bikî hode bizan Iskenderê serdar

Ku qencîtî bikî hode Muhemed şahê cîhan e
Binêre tu li van şahan gelo kîja ji van mane.

***

# Pirsa li dilber

Ez nizanim kanî şêrîn hey hewar û sed hewar
Tu dizanî dilberê min piştî çûna te me jar

Wey li min bî dilberê, min bûye winda çûye dûr
Her wekî Kurdê şikêra, her dikim ez kûre kûr

Ma tu carek nakî pirsê li vî jarê bê xwedî
Çarde heyvên min bihurîn min ti şopa tê nedî

Ez dibêm tu dilgiranî lew dikî xeydê ji me
Hey dilovan em nizanin rêka pirsê tu li me

Ma çi bûye der cîhanê ku tuwî bê şop û ser
Serwerê min tu çi bêjî em bi xurtî têne ber

Ma dilê te bûye pola tu li ser me nagirî
Çi guneh bû hate ser me, em ketin vî agirî

Ez nizanim kê bibînim ku ji wî pirsê bikim
Dûr e destim nîne rêber ka gelo ez dê çikim

Ger çi dilber bûye winda bo çi nadî bersivê
Wey li dildara xwezî ma ka birîndar çî divê

Dilberê gelka dibin dûr lê ji herdû nagerin
Ew dikarin wî bibînin pir heval û hiner in

Wey xwezî min zanîba ka çi bi dilber hatiye
Dijminê wî bergirê wî destbirê wî ka kiye?

Dilberê min meke şermê bêje rastî çi riwe
Bejn û bala te yî şêrîn vê deravê li ku we?

Ew kesê ku rast û çep tevde li wî bûye neyar
Dewletê cîhanê tevde bo ewî nayên hewar

Çi re şerm e kujîqehra herî tilya xwe bi gez
Çi re tirs e ku gelê xwe bikî rizgarî bi lez.

# Dilbera nazik

Ciwan û dilbera nazik tu dotmama kur û merda
Tu dîl maye li nav dijmin neyar hew dest ji te berda

Belê derdê te dijwar e, ti carî ew ji bîr nabî
Dê pismamê te rakin şer, çi dem cîhan ku ava bî

Ciwamêra xwe da kuştin, dil û canê xwe dertênin
Ji bo çavên belek hêja, ji ber destê neyar bênin

Rijandin xwîn ji laşê xwe, ewan sînga xwe kir mertal
Ji topa ew ker û kor bûn, li gasîna dibin qerpal

Ji bo çavên xwe berdane, jin û zarok û malê xwe
Kirin wêran kirin kavil, rez û qûnax û çalê xwe

Xewa şêrîn kirin qetxe, li ser çavan şev û rojê
Ewan qîma xwe anîne, Buhişt navên herin dojê

Li ser kolan û qatê wan, seraser toz û dûman e
Li şehr û gund û bajara, hero lêdan û rûxan e

Ji bo te têşî û birçî, diçin cengê di germê de
Hemî pêxwas û tazî ne, dikin nalan  di sermê de

Nedîn wan şahî û seyran, di vê cîhana rohnî de
Seraser têne pût û ew dibin destar û conî de

Wekî dilber di dojê ye, ewê çibkin ji warê xweş
Wekî dilber di bindest e, ewê çawa nerakin leş

Tevî van renciyê bûrî, dilê wan şah û mîroz e
Ji bo te çêdikin her sal, gelek cejna di Newroz e

Di nav de tê neyarî dê dibînin bejn û bala te
Ta û mafûr kirin kêşî, ji bo raxin li mala te

Dikin karê te hiswar kin, bi hêvî ne tu bê malê
Gelo ma ez dimînim sax, heta wê roj û wê salê

Tenê min tişt nekir bo te, ji alî te fedîkar im
Li cem te zeriya nazik, ji her tiştî ve bêpar im

Belê xwîster mi barandin, ji ber ku tu di bin destî
Ji jana dil dibin agir, ji goşt û reh diçî hestî

Mi çend ristik nivîsandin, bi xwîn û xwîsterê çava
Ji ber ku tu nebûye bûk , reben ez jî nebûm zava

Nikarim ez bikim karek ji bona te heya qozê
Belê ez te jibîr nakim didim peyman û hem sozê

Mi gul xiste du destê te, ji bo te min diyarî kir
Li bendî vê gulê mame, nekir xew min şiyarî kir

Herê min tu nedî aza belê warê te min nas kir
Li ser te dil dibî beryan, bi vî hawî mi derbas kir

Ez im dengbêj û narînbêj, li ser te bûm wekî bilbil
Gulê hê tu di bûkê de, te nabînim dikim xulxul

Ji pesnê te mi dagirtin hezarên rûpel û gehxîz

Bi heyrana du lêvên te, neke carek li ser min lîz

Hezar sal e me şîn wergirt, di bindesta tu pir maye

Bi me jîn bûye zindanek, ji ber ku tu ne aza ye

Emê şîna xwe bavêjin, di şûnê de bikin şahî

Emê bûka xwe bînin mal, bibêjin ax û onahî

Werin roja xwe yî pîroz, were dergistiya xwestî

Were da em bikin dîlan, di vî warî bi serbestî.

***

## Her ji ber jana

Her ji ber jana
Em didin cana
Dijmin nebana
Dibû hesana
Ev welatê min
Bingehê xama
Cihê şelala û
Xort û ciwana

Her bixwîn va reşbelekê her kesê zana

Lê ez ne dîn im
Ez dilbirîn im
Her wekî Zîn im
Ku Mem dibînim
Derdê mi kûr e
Her dil bi xwîn im
Ji bo te rindê
Her bi evîn im

Çaxê ku agir tê dila te'd bîrê tînim

Rindê de rabe
Li vir xuya be
Li min tu şa be
Her dem wiha be
Nexweş niha tên
Li bendî wa be
Ne rûne derve
Li ber gula be

Ji bo birîndara, Tu dermanê dila be

Rabe hevalê Şox û şepalê
Rind û delalê Berx û xezalê
Gula di mêrga Ava zelalê
Hiş û endîş im Herdem li balê

Tenê tu zanî dilber im bi vê hewalê.

***

## Hey gulbiharê

Nazikê mamiz û karê
Ji wê heşarê
Zû were bin siha darê
Ji bo te yarê
Vegerim berî êvarê
Xortekî zava
Pir dikî hêvî û lava
Derkev ji dava
Were bo lîrs û gulava
Ji alî mava
Hatiye bi ling û gava
Hatiye Zînê
Bi weca ku te bibînê
Derdê evînê
Lê giha hestî û xwînê
Karî hilînê
Tu keçê êşa birînê
Bûk hişt li malê
Hatiye gelkî dinalê
Ka were balê
Pirs bike jan û hewalê
Ka li newalê
Bo çi hişt bûka di salê
Jîna min bûrî
Ev reben wiha dizûrî
Bûk ma li dûrî
Ez tenê mame li dûrî
Ka bi wî şûrî

Bibire, serê mi gorî

## Dihatim cihên dilberê

Dihatim cihên dilber Mi dîtin ku vala ne
Hemî sar û bê deng in Temet kor û lala ne

Ma bext e heya dilber Ku tu dev ji min berdî
Mi tenha bihêle tu Li çola di vî derdî

Wekî wan demê pêşî Çima ez te nabînim
Şev û roj ji bona te Bi axîn û nalîn im

Gelo ew demê pêşî Heye vegerin dîsa
Ez û dilbera hêja Werin van cih û lîsa

Heger ez bikim pirsê Ji van kon û şûnwara
Wê kî zû bidî bersiv Ji wan dar û bêzara

Ma wê cih bidî bersiv Di ber dilbera min de
Ya ew kevirê kêşî Ku bûne cihê kurda

Ya ew tifika sê kuç
Ya ew qirşik û ardû
Ya ew xweliya sar e
Ku dilber kirin kar e

Ya ew şêtika berxa
Cihê lê dibû bêrî
Ya ew guherê vala
Gelo yan qetê şala

Belê bersivê nadin
Hemî dilşikestî ne
Hemî bûne wek gêja
Li ser dilbera hêja

Heya nêrgiza yek tê
Ti mayî li benda kê
Li te ez dikim dozê
Li ber vê sir û tozê

Ti jî wek riwê dilber
Ti wek wê dilovan î
Geş û gewr û pîroz î
Şil û nazik û qoz î

Li şûna piyê dilber
Di vê tu di pêş min de
Ti şînbûye hey nêrgiz
Bibî şopikê wek diz

Bi goman dibim dilber
Were rê bide ber xwe
Ti hiştî li benda min
Bipêç xwe li zenda min

Heger min nedî dilber        Ezê te bikim berbisk
Bi te ez bikim sewdan        Ji te bêhn bikim wek misk

Heger ez giham dilber        Ezê te bidim desta
Ez û te emê bimrin        Di hingî wekî mesta.

***

# Hey wax canê

Hey wax hey wax hey wax canê
Xwezya b'  roja Kurdistanê

Kû em tevde b hev re rûnin
Raser wê birc û eywanê
Hingê.. em dê çêkin şahî
Can û dil bibne ronahî
Kurd hingê bêjin onahî
Ronik ber bên wek baranê

Hey wax hey wax hey wax canê
Xwezya b'  roja Kurdistanê

Em hingê dê dilxweş razin
Nazî çêkin bêjin gazin
Wergêrin em xişr û bazin
Deynin govend û dîlanê

Hey wax hey wax hey wax canê

Xwezya b'  roja Kurdistanê

Serbest çêkin em Newrozê

Çola dagrin em bi tozê

Em bidne hevdû pîrozê

Dengê xweş rakî nalanê

Hey wax hey wax hey wax canê

Xwezya b'  roja Kurdistanê.

***

## Xwezya bimrim

Xwezya bimrim hê tu saxî ... Da nexwim janê
Jîna min bê ser jîna ..... Te îro xanê
Hê dil tarî çûbû rohnî... Tû limpê kor ke
Dilber şîn çû, kêfê rake Tû pora sor ke
Avê berde ser vê darê Tû gula bor ke
Bike derman dest û linga Bazina mor ke
Her kes ber bê vê govendê Tû li wan zor ke

Xwezya bimrim hê tu saxî Da nexwim janê
Jîna min bê ser jîna Te îro xanê

Dilber go: Ez bi vê rewşê Her kesî tînim
Ma kî navê ku bê hafê Ez keça Zîn im
Rengê sêva ser darê me Ez gula şîn im
Bûka narîn û beybûn im Kehniya bîn im
Niha karim te bê hiş kim Lê te naxînim

Xwezya bimrim hê tu saxî Da nexwim janê

Jîna min bê ser jîna Te îro xanê

Min go: Min dîtin pir kovan Xweş tu pê zanî
Divêm destê te bighê min Dilberê kanî?
Em herdû yek ten û laş in Tû dil û can î
Werîn bîra xwe qozaxê Vî perîşan î
Li ber deryê te şêrînê Min serî danî

Xwezya bimrim hê tu saxî Da nexwim janê
Jîna min bê ser jîna Te îro xanê

Cîhan tevî tiştê tê de Ez te pê nadim
Mane Tud bê dilovan im Ez xwedî dad im
Wekî terma li ber sola Dê serî radim
Gava tu bê li destê xwe Dê kefî badim
Keçê ger tu nebî bo min Bê ber û yad im

Xwezya bimrim hê tu saxî Da nexwim janê
Jîna min bê ser jîna Te îro xanê

***

## Gul û beybûn

Gul û beybûn li hev rabûn
Bi hevdû re miqata bûn
Ji hev re bersivek dabûn
    Çi gotin min li vir danî

Gulê go: Ez gula sor im
Şepal û pembeh û mor im
Li ser geştê gula zor im
    Wekî min ka di cîhan î?

Dema ageh dibû beybûn
Pelê xwey asîmanê gûn
Bi ser dakir wekî derxûn
    Digo: Hey gul tu min zanî?

Gulê go: Ez te nas nakim
Ji bona te xwe as nakim
Bi peryê te kiras nakim

Ji bo qîza ten û can î

Ewê go: Pel zer û şîn im
Dil û cana çi dikşînim
Meger ez bê hinek bînim
Bi min bawer keça anî

Gulê go: Ez bi katê ve
Wekî al im bi darê ve
Gelo ma qey ji min pêve
Dibî rewşa gulistan î?

Ewê go: Ez biharî me
Ji cem Yezdan diyarî me
Ji pir wara veşarî me
Belê gelkî tu erzan î

Gulê go: Kes mi navêjî
Hebim ger geştê salê jî
Ewê bilbil li min bêjî

Bi dengê xweş, bi nalanî

Ewê go: Ez çi rûxan im
Heşîn im, rengê esman im
Ji rengê goh û deryan im
Tû tenha her li baxan î

Gulê go: Reng çi hawa bin
Ne yêm gul wan xweşik nabin
Heçî zana xwe şa nabin
Bi tu renga.. bi dildanî

Ewê go: Ez te navêm, her
Ji bona xwe.. mi anî: Zer
Ji bo her kes didim dilber
Heçî tê, her, dibê: Kanî?

Gulê go: Pembeh û al im
Di dêma de.. wekî lal im
Li ser lêva.. di her mal im

Nedî kes min bi dilmanî

Ewê go: Wek zerê zêr im
Ji rengê hîv û estêr im
Ji ber çavan xwe vedşêr im
Heya gul Tu perîşan î

Gulê go: Tu ne tenha ye
Li ba min zer heye, vaye
Şemal û naz û hêja ye
Di nîvê min .. diçî banî

Ewê go: Ka emê zûka
Herin cem qîzik û bûka
Binêrin li me herdûka
Gelek kê tênî: Şîranî?

Gihabûn cem keçê: Kumreş
Digo: Bêjin bi dilkî xweş
Li ber çavên we.. kê bû geş

Gul û beybûn.. bi rindanî?

Hina: Beybûn ji xwe'r xwestin
Hina go: Em bi gul mest in
Hina: Zarê xwe jê bestin
Digotin: Kê bi vî zanî?

Giha cem wan: yekê hişdar
Gul û beybûn kirin: Hevwar
Digo: Difrê.. nekin yekcar
Li ser hevdû bi şenganî

Yek e Yezdan ji bona we
Neda cîhan bi yek hawe
Mirov: Hin qîz û hin law e
Bi sed rengî.. li hev anî

Gul û beybûn.. li hev hatin
Dizanîn ku ji yek kat in
Li wan cîhan hemû mat in

Di gel hev kirne dîlanî

Bijîn herdû gulê nazik
Kirin hevdû per û basik
Mirovanî bi lez da zik
Di gel hev çûne bistanî

Heşîn û pembe, kesk û zer
Ji Rojê tev dihatin der
Ji bo hevdû.. nebin berber
Xwedê rewşa we kir kanî.

***

## Hîswerdek li ser dîlokana min

Dîlokana min tu j' bo çi hatî

Ji êş û jan û derdê welatî

Tiştek nikarim bikim ji bo kurd

Ji alî min de hinek xebatî

Zimanê Kurdan bi te xuya ye

Ji me Kurdan tu  her xweş tewatî

Hey ezê bimrim, heye tu nemrî

Tê hey bimînê sax bî li pey min

Qatîzêrê me nîne xizan im

Ji bo gelê min ji min xebatî

Erê tu sarî canê te nîne

Lê ji bo dijmin ceng û şewatî

Bi zarê kurdî tu renge rengî

Di rengê ala li ser kelatî

Ê ku bixwazin Kurdan binasin

Ji bo ewana tu xweş Feratî

Kurdo nebêje, ez bê ziman im

Li wê binêre bo çi tu matî
Şîn bûm ji av û axê Hesarê
Hatim li Sûrî min kir feqatî
Min dest bi vê kir ji derdê dijmin
Bi zehreva yê kurdî gelatî
Li deşt û çolê ber Qamişlokê
Di sala heftê civandî hatî
Di çaxê Barzan tu hatî cîhan
Li Kurdistana Sûrî hilatî
Dîlokê, mi şêst niha likarin
Nizanim beskim, ez di çi katî
Ti l' ba min bûye şêrîn û hêja
Ya pêşî çûye, tu l' pey wê hatî
Berî deh salan min pir civandin
Dîlokê hêja çaxê melatî
Hemî windabûn di bin axê da
Ji zor û tirsa Şahê Qenatî
Hişê min digrî herd û her çêkim
Lê nîne bo min dem û valatî
Belê nikarim wê têxim çapê

Ji ber nebûn û derdê bihatî

Neyar nahêlê, em li çapê xin

Ger ew bibhîzin bûye berbatî

Heye li pey min Kurd wê bixwînin

Yek yek û qol û kok û civatî

Kekê min î Kurd hebin çi kêmî

Li min tu negre ji bo biratî

Kurd û Kurdistan tevî Barzanî

Bijîn bo kêf û rewş û paşatî.

***

## Roja ciwan î

Va çûye ava roja ciwan î
Mirin bi xurtî dibî xuyanî
Di vê cîhanê ka mi çi danî
Ji xwe dipirsim ka mi çi zanî

Sê salê mi va piştî çilî çûn
Riwê min î sor va dibî zergûn
Miwê min î reş gelek sipî bûn
Diçilmisî laş ziwa dibî xûn

Min kire derbas ka bi çi reng î
Ka bi nebaşî yan jî bi şeng î
Şiyar be hey dil va bû derengî
Ma tê weha bî heta bi kengî

Xwedê ejî dam ne vala hatim
Bavê mi dar e, ez jê re kat im
Belê di jînê bê hiş û mat im
Me nasnekir ew va ez hilat im

Di vî welatî me naskirin pir
Mi naskirin wan di nav xir û cir
Gelo hilanî çenda ji min gir
Gihaye çenda hevalî û sir

Ji bo kesî ez nakim neyarî
Ji bo kesî her navêm hejarî
Dilê mi zîze her dem di arî
Li ser xizana dikim şiyarî

Neyarê wî me kesê bi çakî
Ji xap û rîpa ji bo xwe bakî
Ji bo bi zorê serê xwe rakî
Hina dibî jor, hina didakî

Bêhtirê jîn çû, ez bûme navser
Mirin dirûnî li ber mi hember
Tilî hildaye dibî dewer wer
Ji tirs û sehwa we digrim zer

Awirê çavan hindik dimênî

Bê şewq dimênî ev riwê çênî
Hew kar bi barê giran hilênî
Hew kes bi wîna qîma xwe tênî

Heyfa ciwanî wekî gula geş
Li ber mirovan dimênî kelbeş
Bi lez bihûrî salê demê xweş
Di çavên min de, hemî dibin reş

Diran dibin sist ji bo ku hilbin
Nikarî hûrkî tiştê ne şil bin
Wê çilo ev kes ne dil bi kul bin
Tevî ku bêr û bivir li mil bin

Ê ku ji bo xwe cîhan dixwazî
Ji bo ku têde tenha bibazî
Lê kes ji bil wî têde nerazî
Hêjî bi qencî ew dikî gazî

Heger ji bil wî hinek hebin tev
Di vî ji ber wî herin bikin rev

Yan jî li ber wî her venekin dev
Dikarê wî bin bi roj û her şev

Ê ku wiha bî neyarê wî me
Her dem li ser wî ez bigilî me
Gelo kî ye ew, yan ejî kî me
Ejî wekî wî bi dest û pî me

Hingî tu başî çaxê tu rabî
Li pey te, şûna te, pir xuya bî
Heger tu bimrî tu berze nabî
Navê te jî wê di nîv kula bî

Her dem li cîhan meyzê seraser
Ê pir çil bin li pey wan tu herî
Ji tiştê kevnar derengî veger
Hin û hin berde nebêne keser.

***

## Hevala min

Hevala min ceger sext e
Şehinşêrîn li ser text e
Ji bo te ez dikim cext e
Çima tu guh li min nakî
    Di gel ku tu bi min zanî

Gulîsorê bejin sîsê
Keça Tetwan û Bedlîsî
Gula rûbarê Halîsê
Nehêle kes bidî maça
    Ji birh û tuncik û anî

Were em herne zozana
Bibînin merd û hozana
Emê bakin li lozana
Emê bêjin ji Kurdan re
    Dema azadiyê kanî?

Gulîsorê kej û gozê

Ziravê gewr û hem bozê

Didim te gotin û sozê

Ti carî ez te bernadim

Li ba min tu ne erzanî

Berê îro hebûm sêwî

Niha bûm şerker û rêwî

Binêre tu li min dêwî

Ji nû te naskirim xwîşkê

Ji lewra tu li min banî

Xuha min xanim û Zînê

Kevî himbiz ji Latînê

Kemer zêr û xelek çînê

Ezê çawa bihêlim te

Li dûrî bexçe û kanî

Çi heyfa te gulîsorê

Kiras û enterî morê

Ku dijmin lê bikî zorê

Neyarê te me naskir ne

Bi saya yê wekî Xanî

Sitû zîvê kemer zêrê

Ziman hinguv şekir hêrê

Dikim zinhar xwe nespêrê

Neyarê xwe çikû îro

Me pîlanek li ber danî

Li ba min tu çi azîrî

Keçek maqûl û hem çîrî

Mezin bûn em bi yek şîrî

Bibim kor ez bi du çavan

Li ser min tu perîşanî

Nebêj ez kêm û bindest im

Li ber dijmin ker û mest im

Ji derdan bê hiş û hest im

Kuwêt û nav bi dengî tu

Keça Mêrdîn û hem Wanî

Emê warê xwe aza kin
Emê cergê te nû şa kin
Emê bindestiyê rakin
Bila dijmin herin derve
Bibî serbestî kurdanî.

***

# Min tiştek dî

Mi tiştek dî nema zanim
Bi rastî yan bi sehwîr e
Belê tiştê dibêjim ez
Li ber çav e, li ser bîr e

Mi dît qîzek bejin bala
Li ser textê xwe rûniştî
Giran û rind û azîr e
Belê bê kêf û poniştî

Cilê kurdî li ser bejnê
Wekî bax û terazin bû
Bi tac û kember û sîwan
Bi dod û xişr û bazin bû

Guharê zêr di ber biskê
Zerî tarî de îsandin

Ewan zêrê benî bestî

Li jor birha diçîsandin

Hinarê nîv riwê berf î

Wekî sorgul dida pêt î

Dema çavê'm li çavan ket

Nema bo min terek fêtî

Mi got şêrîn te ez kuştim

Bi wê denga li hev hatî

Te berda ser dil û gurçik

Kul û kovan û berbatî

Diranê te didin çîka

Wekî zêrê di şîşê de

Nedî min wek te fentazî

Di Wan û Qers û Mûşê de

Ewan têlê li ser biska

Wekî sîmê li ser pengê

Piling û şêr û cengawer

Ji bo te her dikim cengê

Du birhê tey dirêj rengê

Peza kej himbis û çalî

Tiyên zîvê bejin rotê

Tu şeng û hewrî û alî

Du çavên tey belek yarê

Dirêj û hem bi qozî ne

Tilî movik hemî rexlin

Wekî mûmê tirozî ne

Gulî pengê hevirmîş in

Bi ser piştê de berda ne

Li kot û kember û qolan

Dikim êrîş û serdane

Li ser wan epriyê rengî

Şilêr û gul kirin rêşî

Tirît û pirpirîkê zêr
Li ser sîngê kirin kêşî

Ewê mamiz girêdabû
Li ber naraz û esbistê
Bi qeytanê hevirmîşî
Ku pêçabûn li êrvistê

Temaşa wê li Cûdî kir
Didin mêrg û pez û kanî
Kerî tev bê şivan mane
Çi axînek ji dil anî

Digot: Hey mamiza deştê
Tu zanî ev pezê kê ye?
Şivan û gur xuya nabin
Ku çavên dijmina lê ye

Dida bersiv digo: Bano!
Tu qîza Kurd û şahayî

Di rabûrê tu serbestî
Tu jîr û çîr û xwendayî

Pez û kanî sirast û hop
Tevî lat û ber û besta
Hemî yê pêşiyê Kurd in
Di îro man dibin desta

Ji çavên wan dibarin ter
Li kadê şîn dibûn jê gul
Dihatin ser gula digrîn
Kew û hafo sî û bilbil

Dilê dijmin çi lola bû
Bi ser wan de dikir qîrîn
Digo: Rabin ji bona çî
We çêkir ev hewar û şîn

Mi dît ew gul dibûn agir
Ji wan tîrêj diçûn hawîr

Di sotin dijmin û gawir
Xwe daxistin qul û qawîr

Kewa qebqeb li ser wan kir
Şiyan kir qîqî û êrîş
Kevok û hafiwa pirtûk
Li cîhanê kirin deh tîş

Heçî bilbil dikir narîn
Kesê hat û dibû serxweş
Nema keskî kesî naskir
Dibû ceng û hewar û leş

Nema weqre ji bona min
Ji min qîr çûne esmana
Çilo karim xwe bigrim ez
Li ber van sotin û jana

Ji nû dilber li min nêrî
Dilovanî dida zer de

Bi şewqa herdû lêvê xwe

Hilanîn tarî û perde

Ji nû Bano digot: Bake

Bila her kes werê cengê

Ji dostê dijminê xwînmij

Ruhakin vê zerê şengê.

***

# Bûka cîhan

Qîzek bi navê gul cîhan
Bû bi ser û nav û goman
Ji min xwedî tenê kuj bû
Xortê ewan bûka gîhan

Carek li cîhanê geryam
Min dî keçek bûye hejar
Min nas kir ku ew keçika
Dîl bû di nav êlê neyar

Min dî li hawîr wê leşker
Yek bi yekî mil daye mil
Wê her dinêrî pêşiya
Bê hêvî û pir dil bi kul

Cergê me gelkî pê disot
Agir kete nava me de
Lê ma ezê çibkim tenê

Çawa bikim herme ku de?

Min xweş li ser bejnê nerî
Cîhan ji ber çavên me çû
Min tep li ser sînga xwe da
Da min kişandin por û mû

L' wa keçik hêja ye ew kê
Nav û serê wê birye dîn
Çavên keçê cîhana xweş
Vê demê ew a bûye Zîn

Şehban ew ji mala mezin
Yezdan te kêmî lê nehişt
Paldabû ser texê biha
Wek periya nîvê Buhişt

Hûrik hûrik şêrîn ken e
Nû ji awirê wek şepal
Kê lê temaşayê kirin

Tev can didin pîr û rewal

Bejna bilind û aşîwan
Terha hiner û nû der e
Şîn bû di nêv bexçê gula
Ava rewan her li ser e

Rind û şemal û nazik e
Gûr û geş û sor û bedew
Dilgeş û jîr û holemol
Di her tiya şeng û qelew

Tilî dirêj, hine kezî
Tenê di wan mûmê zer in
Zendê sipî bazin li ser
Yaqût li wan wekî fener

Taca ji zêr û gulgulî
Perî li ser enya kever
Rêşî û gul reng simbil in

Zêr û benî berdane ser

Pora dirêj û nerm û sor
Temûrî û bisk û kezî
Berdane ser wan poşî û
Hibrî, çarçef û ternezî

Dev pir xweşik lêvê tenik
Sor in, diran wekî tewiz
Dêmê fireh sor û sipî
Berf in, wek hinarê gewiz

Ev girêdana xweş dirêj
Pêça bi zîv û zêr û lal
Zeniya bi rêz û xebxeb
Herdû guhar pê re heval

Birhê zirav qûzeqer in
Çavên belek mêjgul dirêj
Difnê çilakî wek sedef

Naz û dilovan dilbirêj

Zenîr û sel û hem perpîk
Zêran li ser sîngê şer e
Kemer li ser newqa zirav
Ser kezî û sîm û pere

Şemka zîper qapik bilind
Kirde biçe ew gav bi gav
Tevde dibê bêhn û bihar
Jê diweşin zêr û dirav

Kerik ji pir ê dawiş e
Fistan ji ermûşê geş e
Xeftan ji keskê werdekê
Narinc û narîn û reş e

Carek ewê gulê me dî
Xwe hilda û digot: Were
Pêşber ewê rawestiyam

Tore veda min li ber e

Got: Ez bi heyrana te bim
Di nav mirovan hatiye
Kêfa wê hat û geş dibû
Di pesnê j' kêfa giriye

Neynik ewê danî li pêş
Kûr kûr li bejnê meyze kir
Çav kil nekir por şeh nekir
Wê j' felekê gazinde kir

Got: Hey felek heyfa me tê
Ez xwestiya dostê xwe bûm
Dijmin revandim kotekî
Xwediya tev bi berze bûm

Ma qey gelo xwedyê me çûn
Hûr û girê wan yek nema
Tev dijmina ez pîr kirim

Ez mam di destê sersema

Hingî ji nişka ve me got:
Mezin ji te re tev mirin
Pir hatine kuştin û çûn
Nûka bi te bîr dibirin

Wê got: Ez baş berê zanim
Ko tu jî xweş dostê min î
Pêş va dibêjim xwediya
Hingê tu dilxwazê min î

Min got ezê can jê bidim
Ez goriyê çavên te me
Raza dila tu bêje min
Gelkî bi we ez ewle me

Wê got: Çi kes xwedyê me bî
Zûka here bêje tevan
Bila me rizgarkin bes e

Em bûne qerfê ber devan

Dîsa girî kirin û şîn
Hûr hûr ji wan çavên belek
Guhê xwe bid çawa neyar
Destê xwe da livê pelek

Ez pir gerîm min got: Ezê
Vêga herim cem xwediya
Ber bêne ser vî dijminê
Hûr û gir û tev cindiya

Ez çûme cem xwedyê ewê
Binyat û serçîrok me got
Tevde girîn kirne hewar
Can û dilê wan tevde sot

Rabûn hemû êrîşkera
Kirin şer benda gawira
Tevde ji nû berbang kirin

Kesê kirin rengê gura

Ew zebir û zora peyda
Serbestî nû destpê kirin
Bûk nû geha cem xwediya
Govend û dîlan çêkirin

Sed aferîn nû aferîn
Kêf nehiştin bona neyar
Dilber nehiştin bê xwedî
Piştî ku pê bûne şiyar

Bindestî û zor û sitem
Derd û kul û êş û reş î
Tevde çûn di şûna wan de
Dihat bihar û dilxweşî.

***

## Keçikên me va bihûrîn

Keçikên me va bihûrîn
Tev bi xişir û bazin in
Xûrxûr û hem şengeşeng e
Ma gelo ew bi gazin in!

Xewka mirov her nema tê
Kes nekî gazin û goman
Yê pîr û nexweş ew ji ber
Ew nû dibê: Ez bûm ciwan

Hin ji wan pir bilind in ew
Hinek ji wan xweş zerî ne
Şepal û hem dilxwîn in
Çav belek û dilbirîn e

Xwedê tenê ew dikarî
Vê derîne ji dila ne
Dilber û can û nazdar in

Wek nêrgiz û hem gula ne

Terih û hem nazenîn in
Xezal û berx û hem kar in
Enî bi zêr û eperî
Ku ew bi cotê guhar in

Li cem dilê wan rewala
Wek bexçene hem bihar in
Zerî geş û sîm û ermûş
Li ser bejna yê dilzar in

Kesk û zer û mor û şîn in
Hem pembehî û rengereng
Gulên sor û zer  dirêjin
Wek hevirmişê pir bi peng

Kemer li newqa pir zirav
Wekî terha şeng mila ne
Bi xweş li wana meyze ke

Ew dermanê pir dila ne

Ji ser heta bi lingan tev
Qol û rist û dir û zêr in
Çarçef dixin li ser sera
Da kes li wana nenêrin

Kes namîne ew li ser hiş
Divê zû ew xwe veşêrin
Bê çawa ew jin şepal in
Wilo cih û der û lêr in

Rûgeş û mêjgul dirêj in
Xwînşêrîn û rohnî netik
Xeftan û kum pir bi rêşî
Şahir û gulac û kerik

Çi kersem û çi kêrêlan
Hemû gulbend û benik in
Lewra qîzê me Kurdan tev

Pir hêja û hem rindik in

Lê hemû tev dilgiran in
Ma wê çi kin ew ji zêran
Heta ku em jî weha bin
Xizan û hem mest û dêran

Sondê dixwin û dibêjin
Em nagihên te bi mêran
Yê ku welat azad bikî
Em ji bo wan sergêran.

***

## Gulzerîn

Gulzerî me gulzerî, ez gula ciwan im
Pir nazik im xweş keçik im ava rewan im
Çavbelek im rûgûz im ez rengê kewan im
Bor û geş im têr pelik im gula bihara
Hûr dirim ez wek ordeka pêşî siwara
Kî mi bibe ez difirim serê zinara
Bo lawikê terix û tenê bi ciwan î
Bendî te me zûka were va çû ciwan î
Vê kedê ma ji vî dilî çawa hilîn im
Ma qey heye vê dilberê carek bibînim
Ne bo te bî hey dilêrê min, ez ne dîn im
Di nav heval û hogira gelkî xwe dibînim
Wekî beybûn û nêrgizan di nêv giya me
Gul û çîçek im têr av didim l' ber siya me
Lê reben im hê jî kiçik im dil ba vîn im
Derdê me barê hasin e kes pê nizane
Min pê nizanî dilber im heval û hane
Dil digivêşim şeker in û ha biha ne

Dengê niyazê dil ava kir ber geha ne

Mizgîn ji bo min hatiye lew dikim şah beş

Nêrgiz ji bo min bîn bikim ewa ha gulgeş

Kerde herê ez li pî me ger biçî Laleş

Ax rebenê dilber wekî bav û xuha ne

Li wa girêda me bi dil îro hesan e.

***

# Dilber

Dilber bakir got: Zû wer
Da em herin seyranê
Min go: Ser du çavên xwe
Va ez hatim heyranê

Wê du awir dabû min
sehwê me girt xwêdanê
Go: Em îro naçin wir
Mala min bi wêranê

Gava min dengê wê kir
Da nîvê dil û canê
Min dî çû qîz û zerî
Li ber bayê wê janê

Dengê diber dijwar e
Mîna kêr û lêdanê
Dilê min her wê disot

Go: wey li min dêranê

Xweş bû diçî al û geş
Da min şewqa ji xanî
Wê xatûna kubarî
Qaza Bedlîs û Wan î

Bi wê bejin û balê
Mîna peşkê baranê
Diyar bû wekî tavê
Winda bûm ji cîhanê.

***

## Koma Narîn

Hene dengbêjê kurda
Bi rastî bûne bilbil
Dengê wa pir şêrîn e
Xweştir ji ney û zengil

Tu nasdikî bê kî ne?
Ew kom koma Narîn e

Gelkî bi nav û deng in
Pir çêdikin govenda
Li Kurdistan û derve
Ta Siwêd û Holenda

Tu nasdikî bê kî ne?
Ew kom koma Narîn e

Xort in gelek hêja ne

Wek şalûla dixwînin
Tîrê tavêjin cerga
Sewdan û hişrevîn in

Tu nasdikî bê kî ne?
Ew kom koma Narîn e

Kurd in ceger biryar in
Li ser Kurdan dinalin
Narînên xwe dibêjin
Xwîster ji çav dipalin

Tu nasdikî bê kî ne?
Ew kom koma Narîn e

Xort û qîzik bi hev re
Dikin halan û qîrîn
Çûk û çivîk dirêsin
Li ser wî dengê şêrîn

Tu nasdikî bê kî ne?
Ew kom koma Narîn e

Ger tu divê bibî hin
Saz û teran û tembûr
Here cem Koma Narîn
Navê ku tu herî dûr

Tu nasdikî bê kî ne?
Ew kom koma Narîn e

Ew mûzingîn û jîr in
Mamosteyê saza ne
Li ber dengê sazê wan
Marê mezin razan e

Tu nasdikî bê kî ne?
Ew kom koma Narîn e

Ew dengbêjê welat in

Di cejn û kêf û Newroz

Paşî li koma Narîn

Dikim serdan û pîroz

Tu nasdikî bê kî ne?

Ew kom koma Narîn e.

***

# Rabe

Rabe serî tu derxe

Boş bûye bo te çerxe

Ev kurdistan wek berx e

Ji nav pencê gur derxe

Ji xwînê çêke merx e

Tevde bi hev te rabin

Bi vî warê xwe şa bin

Ne wek şêx û bega bin

Rûniştin bo me nabin

Nabî hêstir ziwa bin

Agir li Kurd dibarî

Welat hemî bû tarî

Her kesê ku dikarî

Zû hilgirên vî barî

Hey neviyê Sûbarî

Ji Çoman ta bi Sîpan

Bibin rist û şerîpan

Nedin ser xap û rîpan

Nedin ser riya xîpan

Bighên cihê serî pan.

***

## Sirûda min

Birayê min evîndar û şepalo
Kurê pismam e pir Masûm hevalo

Berî îro nezanî min bi rind î
Ku Tu hew çend bi Kurmancî bilind î

Sed û şeş ristebêjê te min xwendin
Mi hiş da ser mi hûrik ew dijandin

Mi xweş zanî Tu zana û çeleng î
Belê hey wax di piştî bû derengî

Te du rohnî bi du çavên xwe kil dan
Belê zanim bi dijwarî te dil dan

Bi yek destî Tu hiltînî kul û êş
Bi destê dî Tu ristê me dikî kêş

Bi yek çavî birîndara dibînî
Bi çavên dî pelê kurdî dixwînî

Bi destê xwe kul û jana dimalî
Bi cerg û dil ji bo Kurdan dinalî

Bi yek darê du ber jê têne xwarin
Li ser şaxê te sêv û hem hinar in

Ji yek hênê werivtin şîr û hingiv
Li ser mejyê te zanatî dikî çiv

Ji ber ku tu ji Kurdan e dikim fîz
Meger dijmin ji bêgavî bikin bîz

Ji êşnasê me Kurdan min nedî bû
Li zarê me di rengê te xwedî bû

Ji malbata we yê xwenda û zîrek
Nedî kes min ku hildabû nedîrek

Ji wê mala mezin a pir bi namûs
Nebûn hişyar ne tê çendek serîxûs

Belê tu roj bi roj serbest dibakî
Ji bo ew mal ji razanê xwe rakî

Ji bona te dirûd û pesn û şabeş
Dimaçim ez du sed carî riwê geş

Mi ev xêzek ji bona te nivîsî
Ji wê bêhna li sorgul bûye xwîsî

Gula min ya sekê gohê Şerefdîn
Ewa mor û geş û narîn û xweş bîn

Mi tevlî kir hinek ava ji Aras
Gulav û bîn û mawerdê gelek tas

Li ser paçê hevermêşî mi danî
Kevokê ew li ser peryê xwe anî

Birayê min veke hûrik bixwîne
Dilê te wek dilê min tev birîn e

Li her tîpê bi du çavan binêre
Hinek başqe nivîsandî li yê re

Bi wê xwîna gewez a nîv dilê xwe
Mi xîz danîn li gor jan û kulê xwe

Mi tê de got: Hewar e sed hewar e
Gelê kurdî di cîhan bo çi jar e

Çilo em tevlî van derda dibazin
Ji kê em dê bikin zarî û gazin

Divê em tev bikin dozek avatî
Heye rojek bibînin em azatî

Bira Tu xwe ji vê rêçê neborde
Ji ser çavên te çûye paç û perde

Di dîrokê bila navê te geş bî
Ne wek hinka li cem Kurdan tu reş bî.

***

# Ji bo Mamoste Hadî Behlewî

Kurê seydayê Qerqatî birê min
Tuwî /Hadî/ tu dost û hogirê min

Bira mamosteyê rind û dilawer
Ezê bêjim ji min xweş ke tu bawer

Berî heyvek mi gotar in bihîstin
Ji tirsa wan mi ev xîzik nivîstin

Digotin: Baseke çift û bi bêtar
Çerixt û ew kesê tê de ketin xwar

Ji /Xirbê Şêx/ mirovek bû birîndar
Sisê jê çûn, mirovên wî kesê jar

Kula mestir digotin: Ev mirovan
Ji dûr dighêne te /Hadî/ dilovan

Mi hew tu dî /dikan/ girtî bû her dem
Mi keskî nas nedî ku ez herim cem

Ji bo ku ez bipirsim ka çi bûye
Rê û şopa ewî gundî li ku ye?

Ji hingî ta bi îro ez nexweş bûm
Li alî te fedîkar û ne geş bûm

Sir û serma tu zanî bê çilo hat
Hemî jîndar û şînahî kirin mat

Kula min ez bihata min tu dîba
Ewê kuştî çi dûrba yan xwedî ba

Niha jî ez nizanim ew çi tûr in
Xezûran in mirov in an jî dûr in

Çi kes bin jî kula wan pir giran e
Çikû Kurd in wekî te ew bira ne

Dilê te ka çilo têşî birader
Ejî wek te şikestî me bibawer

Berî wan piştî wan jî pir mi dî ne
Mirî kuştî cihan herdem bi şîn e

Xwedê naz û dilovanî li wa kî
Di cîhana duyem de wan riha kî

Emê tevde herin piştî ewa re
Seraser ev cîhan qîr û hewar e

Bimînin sax mirov û zariwê wan
Di gel te her Xweda bida riwê wan

Niha ez vê nivîsarê dişînim
Belê hê jî divim ez te bibînim

Çikû mala te nasnakim li dûr e
Fedîkar im di şerma min bibûre

Li ku ez bême cem te ka bibêje

Hişê min her di vî tiştî de gêj e

Birayê min bide alê min bersiv

Bi wî zarê xwe yî şêrîn û hinguv.

***

# Tu Hêzdan î

Tu Hêzdanê cîhan tevde, di fermanê tu gengaz e
Tuwî şahê hemû tiştan Te cîhan çêkirî taze

Te anî ser riwê jînê zemîn û av û derya tev
Te heyv û roj kirin ronahî bi wan danî Te roj û şev

Te rawestandî heft azman Te histûn û dîwar navê
Te heft qarê zemîn tevde çikandin ser riwê avê

Li her gahî di her çaxî li kî rex bî Tu beşdarî
Hiner nîne ji bo canan di her tiştî Tu serdar î

Nizanin kes Tu çawanî Te nas nakin ji cîhan kes
Tu nel jor î û nel jêr î Tu nel cîhan û nel berces

Dil û bîr û hiş û goman xwe naghînî kenarê Te
Hemû mat in di pesnê Te ta bighê berhinarê Te

Tu bê hev eynî ne'd rengê ti tiştî bil ji Hêzdan î
Di yek tiştî di yek pesnî di şar nîne Tu wek wan î

Nebû tiştek Tuwî yê ku heyîn çêkir nebûn kir
Tuwî pêşî Tuwî paşî mirin nîne Tu saxî her

Tu Keyxusrî di her tiştî Buhişt û yan çi Dojeh bî
Tuwî her yek dikî tiştek çi kole yan çi paşeh bî

Tu qenca qenc dikî nîne ji cem wa qencî yek carî
Tu pîsa pîs dikî dîsa sitem nîne Tu serdar î

Hezar hozan û hişkûran ji xwe re gotin Tu pir dûr î
Ji naskirna şahê jor î Tu ne'j arî Tu ne'j nûr î

Di rojê sed hezar carî didim pesnê te paşa yî
Dibim daqûl ji bona Te bi fermana Te zana yî

Bi rast û bi qencî Tu dikî karê heyîndaran
Şehînşah im Tu pêşkêş î Tu rêzanî di her karan

Me xwe tevde sipartî Te di herdû çax û cîhanan
Tu çêdikî Tu bi min zanî Tu pir dûr î ji pilanan

Belê yê ku Te naskirne ji sed goman yek û du ne
Hişê canaweran tevde ji naskirna Te bi kone

Te karîbû bi her tiştî bidî zanîn û xwedî ne
Nizanim Te çima çêkir ku candarek Te nabîne

Nizanim ez bikim peyvê ji alî Te li gorî dil
Çi tiştek pir giran e ev ji dil dernakevî ser mil.

***

# Dost û bira

Hey dost û birayên me'y misilman
Guhdarê me bin, bi herdû guhan

Pesnê Rojiyê ezê bibêjim
Ger çi ez nizanim lal û gêj im

Mizgînek mezin vaye ji me'r hat
Pir heyvek biha vaye ji me'r hat

Ev heyvek bi deng e ya Xweda ye
Ferman pê bi Qur'anê de daye

Ev heyve pir bi nav û deng e
Pir naz û delal û şox û şeng e

Hêzdan ji me re kire diyarî
Wer gotine Mislim û Buxarî

Salek va bihûrt em çavenêr in
Berbendî evê heyva bi xêr in

Vêca jin û mêr tevde bizanin
Hûn îro di cengeke giran in

Hey xûşk û bira berêve rabin
Çavên xwe vekin ji nû ve şa bin

Mêvanek mezin vaye ji wer tê
Îro kî ji babetî wê der tê

Lew tê de ji asman hatî Qur'an
Daketye evî asmanê cîhan

Hem gelka li ba xwe kirne bawer
Ku şêva Mezin li wê bû yawer

Surişt û perî hemî dibin rêz
Dîlanê dikin bi xeml û hem xêz

Kî wê bikirî bi medh û xwoşê
Wê tancek ji zêrê zer bipoşî

Hem gotiye Wî Şah û Xwedan im
Rojî ya min e Ez pê dizanim

Heta heyv kuta bî bighê paşî
Zarî lê dikim surişt bi başî

Xêr û gunehê wî pir bi kat in
Mîna yê berê bi heftê qat in

Dergehê Buhiştê bê derî ne
Hem dergehê dojehê girtî ne

Sûc û gunehê me têne şûştin
Zarî her dikin herçî surişt in

Hem dêw û perî têne girêdan
Pir wêde bibî ji cem Xwedê dan

Hem gorê mirovan tev dibin xweş
Xwedyê guneha hemû di dilgeş

Hem ê ku di wê de bît gunehkar
Muhemed ji wî re nabî ber bar

Nav û devê wan gava ziwa bûn
Lêvê wa sipî bûn bê rewa bûn

Zer bû riwê wan çav şikestin
Bê zar û xizan û jar û mest in

Masî tî di nav wan û Xwedê de
Yek perde tenik ji nû di rê de

Asman û furist qad û giyandar
Tev mehder dikin ji bo ewê jar

Bêhna wî devê kesê bi rojî
Nahêlî di nav agir bisojî

Hem jî xweştir e ji her çi bînê
Ew bîn li cem Wî Xwedanê jînê

Wî peyxemberê delal û paqij
Gava di rewî li ser dibû mij

Wer gotiye wî bo Rojî giran
Çêbûne du kêf û naz û seyran

Çaxê ro diçî yekî dibînî
Ya din ku giha Xwedê dibînî

Gava nû diçin derê Buhiştan
Pêlgahî dikin gelê suriştan

Sed rengî xwarin û vexwarin
Şêrîn meyxweş û tirş bê jimar in

Vêca her dibêjin noşîcanî
Nûka de bixwin gelê cîhanî

Lewra hûn Rojiyê de tî bûn
Xwarin we nexwar hinek birçî bûn

Ê tê de herî civata qencan
Ew kes dûr dibî ji giştê rencan

Her gavekî tavêjî bi bal ve
Mîna ku limêj dikî ji sal ve

Hem wê ew hebî di roja şîwan
Rûniştî li ser wî text û sîwan

Hem pêxemberê delal û hozan
Wê germa giran dişînî zozan

Ê ku limêj kî tim bi hev re
Carek ku dibin daqûl bi hev re

Bajarek ji nûrê jê re kar e
Ka kî pê dizanî ew çi war e

Ê ku qenciyek bikî bi dê w bav
Hêzdan pê dikî di her dem û gav

Hem pêxemberê delal dibêjî
Ez dê wî kuta kim bê dirêjî

Ê karek bikî ji bo misilman
Bona wî dikî Xwedê hezaran

Ê jar û reben Xwedanê kuflet
Qencîkê bikî li wî ne rûmet

Pir ew bilind e li cem Xwedanî
Xêr lê pir dibin di rengê kanî

Pîrek ku dilê zilam dikî xweş
Wek Meryem û Asiya dibî geş

Ê ku xurînî ya misilman
Bişkênî meger bi av û xurman

Mîna wî kesê kolek eza kir
Lewra wî ewê bi rojî şakir

Her şev ji şeva heyva dilêran
Şeş sed ji hezarê pîr û mêran

Aza dibin ew ji agirê reş
Tev diçne Buhiştê naz û dilgeş

Ev heyva mirov cîhan ji milkî
Ev heyva mirov zendê xwe hilkî

Ev heyva mirov bibî dilovan
Her qencî bikî di gel mirovan

Ber her kes bikî qîr û girînê
Derman dikî ew kul û birînê

Ev heyva mirov rê de bibin jîr
Hem roj û şevan Xwedê neçî j'bîr

Ev heyva mirov tê de nerazî

Ev heyva mirov tê de bibazî

Ev heyva mirov tê de bitirsî

Ev heyva mirov li xwe bipirsî

Ev heyva mirov tê de şiyar bî

Ev heyva mirov tê de likar bî

Ev heyva mirov tê de nekî kîn

Ev heyva ku her kes guh bidin dîn

Ev heyva mirov tê de limêjkî

Şehdêwan ji qehra ker û gêjkî

Şabaş bi te hey miha Xwedanî

Şabaş bi te hey miha dilanî

Şabaş bi te hey miha dilawer

Şabaş bi te hey miha sizawer

Şabaş bi te hey miha civatan
Şabaş bi te hey miha xelatan

Pesnê te ti carî nayê gotin
Ku zar û ziman tev bêne sotin

Lewra ku Xwedê pesnê ji te'r dan
Îdî em gerîne mat û gerdan.

***

# Pesnê pêxember

Ezê pesnekî baş bibêjim bira
Ji bona Muhemmed şehê serwera

Ji bo ku li min carekê meyzekî
Ji êşa me re derdekî peydekî

Ji bo van gunahan bikî mehderê
Ji bo ku bi wî ez dikim bawerê

Muhemmed dinêrî li hawîr cîhan
Di nasê kesî ku dikî qenciyan

Dizanî çi tiştê li cîhan hebî
Çi yê ku xuya bî çi yê berze bî

Li ser wî furuşt her dikin kar û bar
Dikarin di cih de bisojin neyar

Bi gewdê xwe çûye belê jîn deye

Bi can û rewanê xwe her dem heye

Di gorê de sax e Xwedê gotiye

Bi hoş û bi endîş wekî pêşî ye

Misilman çi bêjin ji baş û guneh

Ji wî re dibêjin dirêj û fireh

Ji gunhê me her ew dibênî fedî

Belê xwe ji bo me dibênî xwedî

Dibêjî furişta ti tiştî nekin

Derê qenciyê hûn li ber wan vekin

Heye ew di paşî bibin poşîman

Di pey wî re çêkin jin û sermiyan

Li me her dikî ew dilovaniyê

Tevî vê nezanî û kêmaniyê

Heger nav ji wî re bi qencî herî
Dikin zaniya her ji wî naqerî

Dibî serbilind û riwê wî geş e
Dibî aferîna dilê wî xweş e

Heya serwerê dar û mêrg û Buhişt
Ji bo me tu hetwan û derd û nivişt

Tu hatî de em jî bikin qenciyê
Ji bo em li keskî nekin renciyê

Belê tu çiwî, em di tarî de man
Her û her ji me der dibin sed ziyan

Dilê me bi te pir gelek şadibû
Me goman diyar ku tu  zû radibî

Belê sal bihûrîn li çardeh sedan
Di piştî te re em gelek bûn geda

Nizanim tu kengî ji cih radibî
Hewar e dilê me çi dem şadibî

Cîhana me bûye cihê zor û dar
Nema em dizanin li kê kin hewar

Tu jî bûye cîhan ji zor û guneh
Ne gazî heye em bikin yan gileh

Misilman wekî gawira bûne hov
Nema kes dinasî Xwedan û mirov

Kula wan bibin dolemend û bi zêr
Bibên wey li wî yê bibî xurt û têr

Li hevdû dixin ew li ser polekî
Dikin şer li ser kavil û çolekî

Ji hevdû diraxin hezar kuştiyan
Li çola dimînin wekî piştiyan

Du sed salî şer kin kesek nabê: Bes
Ji bona Xwedê kes ewa nakî tes

Kesê xurt nema guh didî yê xizan
Hin û hin dibin pir hevalê dizan

Heçî mêr hemî bûne serqot û rût
Heçî jin hemî bûne tazî û şût

Jin û mêr li hevdû hemî bûn kedî
Bi hev re diçin sînema bê fedî

Tu karek nema ye ji bil kêf û mey
Bi lîstik bi tolazî û saz û ney

Heçî mêr di destê jina bûn pepûk
Bi hev re dibazin di bajar û sûk

Piçûk û mezin hew li hevdû dikin
Ji kê re tu bêjî dibê: Em çi kin?!

Bi gotin bi şîret bi nermîtiyê
Nema kes dibî guh li bavîtiyê

Gelo hê gelek maye bona dema
Gelo maye hindik dirêjî nema

Gelo bê ji bo me wiha dem hebî
Gelo yan xweşî wê ji me berze bî

Gelo wê guneh dem bi dem pir bibin
Gelo yan heye em hemû qir bibin

Gelo qey heye qenciyek bê cîhan
Ji cîhan herin pîsî û hem ziyan

Ji bo min nema ye hiş û hem goman
Nizanim nizanim bi karê Xwedan

Xwedano nema ye ji bona me lîs
Me derxe ji van kar û bazar e pîs

Hinek bûye paşa hinek kole ne
Hinek sermiyan in hinek tole ne

Heçî radibî hew dibê: Mane em
Bila em nemînin, di destê sitem

Xwedê her nehêlî em in bê hiner
Wekî sêwiya em hemû man li der

Heya serwerê min Muhemmed were
Çi tiştê tu bêjî emê bê ber e

Hilîne ji cîhan evê tariyê
Riwê me bişo tu ji vê ariyê

Çi bêjim nikarim bikim ti kedê
Dixwazim tu destê mi her bernedê

Herê ez gunehkarekî bê ked im
Belê ez riya te divê bernedim

Hewar e Muhemmed were em mirin

Neyarê me xurt in, ji me zor birin

Bi gorî te bim her tu pişta me ye

Dilê me seraser li te ewle ye.

***

# Şîna Hesenê Kurd

Hezar û nehsed û heştê û pênca
Meha Îlûnê çardeh bûne varî
Kulek hate dilê min bûme şeyda
Li Qamişlo mi dît qîrîn û zarî
Hesenê Kurd di îro bûye winda
Te xiste nav me Kurdan cergesarî
Herê îro te xatir xwest ji kurda
Kula te ez ji bîrnakim ti carî
Dugir bûye miringaha me kurda
Tu jî kurdî li wir bûye veşarî
Çi heyfa te, tu bû berze ji cihan
Şiyarê Kurd bi rastî tu Şiyar î
Çi pesna ez bibêjim tu li gorî
Ji tîpvanê me Kurdan tu bijarî
Di nêv Kurdan tu berz û serbilind î
Tu seyda ye tu zana û siwarî
Tu derya ye tu kûr î dilnedîr î
Bi tîp û xwendin, rengê biharî
Hevalê Pîr Seîd û Paşe Ihsan

Ji bo Kurdan tu kulgîr û bi arî
Ti car sala ketî zindanê tirka
Dilê te pir li ser Kurdan diarî
Tu bû şîretkerê hêzbend û koma
Ji bo Kurdan te jî dîtin heyarî
Te rik dabû diz û hîz û nemerda
Bi dijmin re te ajot pir neyarî
Ji bo Kurdan te pirtûk pir nivîsîn
Bi xîza xwe tu xweş bûye diyarî
Tu babet bû ji her tiştê mezin re
Tu axek nerm ji bo çandin dibî tov
Belê çibim tu bê av û beyarî
Girê Dugir bi te pîroz û geş bû
Li gora te dilovanî dibarî
Ji karwanê şoreşgêra tu yek bû
Te jîna xwe li cem wan kir siparî
Ewê ku tu diçî nik wan heval in
Welatxwaz in di gel wan tu bi parî
Hesen kurdo birakê min biger zû
Li nav dost û hevalan ta tu karî
Ji alê min gelek pesn û gulavan

Bid Kurdê li wî bajar û warî
Biramûse pî û destê hevalan
Bipirse li qencê wî diyarî
Bike pirsê li Hemza beg dipêşî
Gelek dilxweş bike wî xwendewarî
Li Nafiz beg li Mûsa beg li Haco
Li şêrê Kurd Hesen Haco du carî
Li Arif beg li Danîş ew kurê wî
Heçî Kurdê li wî kaş û pesarî
Bi govendê herin cem serwerê kurd
Serek Barzan bi maçan wî bilorî
Bi mizgînî bibêjin jê re hûn tev
Gelê Kurd pey te de rûhişte barî
Nivîsarê xwe deyne ber civatê
Bibêje wan li çapê xin Hewar î
Mirin bû fer li jîndar û mirova
Mirin hat û tu pê re çû neçarî
Ezê bighême te mala mi çêke
Li ber çavên mi cîhan bûye tarî.

***

# Şîna Cegerxwîn

Ezê bêjim ji dil bakim
Gelî hogir û guhdêra
Gelî dost û hevalê min
Gelî xûşk û jin û mêra
Cegerxwîn bû çemek bê ger
Emê her jê vexwin gêra
Li nav xaka me rawesta
Dibarênî ji me'r zêra
Li hawîr av didî baxa
Geya rakir netel pê re
Diparast û li hev kom kir
Zimanê go bi wî gêr e
Bi dawa kedxura ne'd girt
Xwe nespart va xudan xêra
Ne tekya şêx û mela va
Ne ser nizmî ji axê re
Ne jî stûxwar ji axa re

Şikand pişta kesê xwînmij

Bi xam û xêz û da fêra

Tiroman û bi Hitler re

Didan ber pehn û ber kêra

Wekî Xortkî û Tolistoy

Ji bo karkir te dan hêra

Te rê xweş kir ji bo cotyar

Te wêrankir cihê têra

Serê Kurdan te hilda jor

Bi te wêje ne serjêr e

Te tora wa gihand stêra

Di Lorka ta geha Derwîş

Şikispîr ta bi Valtêr e

Di Hîgo ta Hemingwayî

Te cêza va teva dêra

Te bêjing kir ji hev bêş kir

Te werbêş kir te kir têra

Ji bo Kurdan te bihtir kir

Ji Hîto û ji Andêra

Bi ahînê gelek dijwar

Te bûrand jîn te dan êra

Tu bû rohnî li Kurdistan

Tu bû qirdê xwedî bêra

Xedîr û çem, zinar û lat

Çiya û deşt, gir û sehra

Devî û dar, gelî û kanî

Newal û mêrg û avgêra

Tivilk û kew, qerak û qitk

Kevok û çûk mê û nêra

Kulîlk û nêrgiz û cûrî

Binefş û çîçekê dêra

Gelawêj, kadiz û perwîn

Tevî koma bi rojê re

Eva hemyan girêdan reş

Gulî pêçan guhar pê re

Teva gotin bi hevdû re

Hewar û sed car hewar e

Cîhan bê bext û bê kêr e

Hevalê wa Cegerxwîn çû

Dilê wa bû kula têra

Bi kulma çûne sînga xwe

Dil û gurçik ketin jêr e

Li ser Seyda civat sar bûn

Pez û berxa nema çêra

Me da pey ê Ceger xwîn kir

Divê em guh nedin para

Divê em şoreşê gur kin

Neyara bixne bin dara

Ji bo hew Kurd bibin bin dest

Bi şahî em vekin tora

Bi cenga dijmina bigrin

Bi koma wan bikin gora

Xewek şêrîn zerî razin

Piçûk kêfê bikin pev re

Dibistan vêkevin nû re

Bibin kelhê jin û mêra

Sitemkarî bibî bara

Piling û sîxur û şêra

Cegerxwîn sed hezar mizgîn

Tu mayî kaniya çara

Nema piştî te Kurd dişkin

Nema razan li şûnwara

Te dam kir tev te da axê

Nema dimrê liba dara

Cegerxwîn ma çemek danîş

Emê her lê vedin tora

Çemê da karûba kurda

Bi şev rohnîgehand kora

Çemê bêhna neyar çikand

Serî gerand li çavsora

Vewest xaka me lê xweş kir

Bihara tê de nêçîra

Welat bû pêçeka birçî

Çemê Seyda tijî şîra

Vekir bendek ji dergûşê

Guhert têr kir ji pêsîra

Li ber pêlê xwe kevnî bir

Vekir nûtî ji zencîra

Lehî rakir şikand darê

Sitemkarê hej û gîra

Wekî orta didê xwînê
Kesê jar bê rewa pîra
Ciwan û bengî û xurt e
Leheng û mêr û pêşbîra
Li ser kêla te wê bişkê
Serê namûsizê mîra
Ewê xayin û hem caşa
Li ber germa te wê geş bî
Çira bindest û hêsîra
De va rev man ceger rakir
Buhişt tev hinguv û şîr e
Sema û reqs û dîlan e
Bi Xanî û Cizîrî re.

***

## Roja veşartina cendekê Cegerxwîn

Sed car tu li ser çav û ser û destê me hatî
Seydayê Cegerxwînê mezin, mêrê Hesarî
Seyda serî rake zû binêre bê çi bûye
Rohnî çû ji çavan der û cîhan bûye tarî
Navê te belabûye û her kes te dikî nas
Bo vî gelî, dîtin te ji pêşî de hejarî
Bawer em seraser bi vê çûna te diêşin
Lewra em bi navê te gerîn baş û diyarî
Mêr û jin û xort û keçê Kurdan vaye hatin
Ronik wekî baranê li textê te dibarî

Ev heyv çi dijûn e pir bi jan û kul û derd e
Tevlî evan derdan te jî pê re serî danî
Kurd îro li pey laşê te bûne wekî derya
Her yek dibê: Seyda çilo çûye? Gelo kanî?
Hey wax felekê tu ji me îro kirî winda
Pir kes hebûn dixwaz bibin gorî ewî canî

Pesnê te belav in ez nikarim binivîsim
Ger arî mi kin sed kesê hozan wekî Manî
Xwezya min bi saxî berî mergê tu bidîta
Pirsek min bişanda te bigota ji bo Xanî

Seyda tu bi rastî ristevanê gelê kurdî
Ma kê berî Seyda li vî warî gilih rakir
Berya pêncî salî ewî dîtin kul û kovan
Jana dil difûrî ji hinava ewî bakir
Seyda ger mi gazin ji te kirye min riha ke
Gunhê min bi min îro li alê te xuya kir
Lewra em bira bûn me li hevdû dikir azî
Ger dost nebin kes bo te dibêjî te wiha kir
Ê tu diçî cem wî li wê cîhanê bibîne
Bêje min ji dostî ev digot û ev wisa kir

Dar û gul û terhik li Qamişlo tev dinalin
Bo merga te mêvanî te Seydayê Cegerxwîn
Qîz û keç û nazik kilê çavan diweşînin
Rengê xanimê me'y li Cizîrê sitî û Zîn

Xort û kur û merdê me ji bo te sernixûn in
Digrîn wek mirovê ji evînê serxweş û dîn
Dîlok û sirûdê te li ser desta dixwînin
Tevde li xwe pêçane ji bona te reş û şîn
Pirtûk û nivîsarên te yekser kirin hembêz
Ayîna riwê te wekî nêrgiz dikirin bîn

Kolan û şeqamê me ji tozê bûne winda
Leklek têne ber te hin peya û hin siwar in
Saz û ney û dahol û kevanan guh çirandin
Hûr û girê bajêr va di îro bi hewar in
Vîna te neçû ser bi evînê tu cuda bû
Lew em dilbirînin, em ji derdê te hejar in
Kêfa te bera bê, em bi derdê te dizanin
Mizgîn bo te îro em hemî jîr û şiyan in
Warê me di îro bi şer û ceng wekî aş e
Em germ in bi cengê lê bi merga te hem sar in

Kurda ji te hezkir tu mirovek bê ziyanî
Der vê em yek in tevde bi hev re em nebûn beş

Kurdê me yî razayî te pêşî kirin hişyar
Peyvê te yî şêrîn ew vejandin bi dilê xweş
Gava me pirtûkên te didîtin di wê çaxê
Rengê gul û narîn dil û dêmên me dibûn geş
Pêşî berî her kes te kula Kurdan hilanî
Dîtin te ji zûde pir derav û demê rûreş
Dijmin pir dibazî te ji cîhanê cuda kî
Şabaş ne bi destên wan cuda bû ev ten û leş

Dîtin te ji bo me pir dijûn û tep û zincîr
Qîma xwe te anî bi cihê tarî û zindan
Çibkim her mirovê wilo dilsoj û evîndar
Warê wan dimênî navbera mêkut û sindan
Her dem te bi zirta berî dabû dijminê xwe
Êrîş te dibir wan bi hewar û cef û heydan
Dîlok te dixwendin wekî bilbil nediwestî
Carek tu netirsî ji felaq û şiv û lêdan
Gelkî te diwêrî wekî şêra tu dirabû
Gotin kê bigota te ji wa her nekir sildan

Şabaş bo te ku tu xwendevanek pir bilind î
Wê kat bidî herdem bo gelê me wê bibî nû
Pirtûkên te piştî te re em dê hûr bixwînin
Da em xweş binasin vê evîna te wekî mû
Tiştê ji te hat û ji bo Kurdan te ji dil kir
Nabî bibî winda ji dilê me wê herî kû?
Seyda ji Siwêdê, te xwe anî vê Cizîrê
Da em te bimaçin bi mirîtî her bijî tu
Pir kes ji me Kurdan ewê hêja çûn berî te
Oxir bî ji bo te wey gidî vaye tu jî çû!.

***

## Serdana gora Cegerxwîn

Seyda em hatine da ji te'r patekê lêxin
Gora te bibînin, fenerek bona te pêxin

Karê te bi avê de neçû, Seyda binêre
Kurda  xerc kirin bo te gelek mohrî û zêr e

Gora te kirin av bi hindayîz û terazî
Rûmet wan kirin bo te bi dilxwaz û bi nazî

Lewra wan kirin ava bo van ferişkê mermer
Şahî kin bi nîgarin ji sor û sipî û zer

Ê gor çêkirin pesna didin bo wan bi bara
Comerd û ciwamêr in ji bo Kurd û şiyara

Em hatine da em evê gorê bikin pîroz
Em dê bikin dîlan, di vî warî wekî Newroz

Em dê ser zikê wê gulê rengî bikin kêşî
Hawîr pêde berdin sîm û ermûşa bi rêşî

Ava gul û nêrgiz bi piyana bireşînin
Pelkê bihn û sêva bi du çenga biweşînin

Xort û keçikê me bi wî dengê xwe yî pir xweş
Narîna bibêjin dilê tarî bigerin geş

Pesnê te xuya kin her bixwînin wekî bibil
Bajar bibî wêran bi zimîn û şek û xulxul

Qandûlka biîsin û şûşê qenda bişkînin
Alan li hawîrê evê gorê biçikînin

Serjêkin li ber te bikin gorî pez û berxa
Hawîr te biçînin wekî sênca gul û terxa

Seyda tu binêre ev cîhan paşî geda ye
Bê bext e mirin ku bi yekî wek te giha ye

Du sal va bihûrîn tu di gorê de dirazî
Rabe bide qîran li me Kurdan bike gazî

Da sir bidî canan wekî pêşî bibin hişyar
Da bo vî welatî em bi xurtî vegerin kar

Canê te yî paqij bûye winda hey dilê min
Em mame li pey te wer binêre li kulê min

Rewşa te ji ber çavên me naçî hey Cegerxwîn
Reş bûye li ber çavên me piştî te re ev jîn

Sozê ez didim te, te ji bîr nakim ti carî
Xwîster ji dilê min li zevîna te dibarî

Pesnê te nikarin bicivînin xwendin û zar
Zanîn û nerîna te fireh kirne nivîsar

Her ku tu dibî hişk dem ji merga te dibûrî
Bêhtir tu xuya ye, di dilan de tu nedûrî

Laşê te ji zêr e çi dimênî hey dibî geş
Nava te ye şûşe tê de nînin deqerê reş

Peryê te ziwa bûn li welatê me weşîn e
Tovê xwendina te di dilan de bûye şîn e

Bêhna ku dibarî ji te rengê gula sor e
Peryê wê bibin hişk belê bêhna wê hilor e

Ger tu niha hişkî pel û şaxê te ziwa ne
Bêhna te bela ye, cih û şopê te xuya ne

Çavan veke Seyda were, dîsa bike larî
Ristê xwe bibêje bi zimanê xwey Hesarî

Hawîr te kolanin cihê gora te çi şên e
Mêvanê te zaf in ka tu destê xwe derêne

Da em bi giranî bi du lêvan wan bimaçin
Ger tu ne derînî em ji ser gora te naçin

Em tên te dibînin lê mixabin dûr e xanî

Dijmin kire qetxe em bibînin wî li banî

Kurdê vê civînê hûn seraser sax bimînin

Tiştê hûn dizanin di vî warî de bixwînin

Yek yek tev de bêjin bo Cegerxwîn pesn û şabaş

Her dem bo Cegerxwîn her bi qencî bikin dabaş.

***

# Şîna Şêx Ehmedê Xiznewî

Ez her dikim pesnê Xweda
Min dî di vî çaxê dema
Şêxek mezin va bû xuya
Rêza xwe anî j' Serheda

Şêxek ziman şêrîn û qend
Avête qencî herdû zend
Şewqa xwe avête welat
Hildaye ala Neqşebend

Şewqa Ezirbeycan û Hind
Gihaye Xizna gund bi gund
Lew bûye textê Neqşebend
Ev tekyexana pir bilind

Şêxek bi deng û rûmet e
Ew peyrewê şah Hezret e

Nûrşîn di pêşî kanî ye
Pey wê de bû ev binxet e

Ma kî dizanî ew kî ye?
Anî bi tîr û pêtî ye
Cîhan li Xizna lê qorî
Ew Ehmedê Xiznawî ye

Xelkê gelek dîn kir ji bîr
Saya ewî dîn hat Cizîr
Tarî ji vê çolê hiland
Jê lerizîn şah û wezîr

Bêhna ji kafûr û gulav
Wek tav û baran û xunav
Li cerg û can û ser dila
Barand û hawîr kir belav

Cîhan bi wî bû şadîman
Rûnişt li ser textê zeman

Rahişt ewê rêça durist
Pîr bûn bi wî xort û ciwan

Xelkê ji wî dîtin hiner
Ji hoş û hîndiş bûne der
Şêx û mela tev dîn kirin
Bo wî tewandin çav û ser

Bavê Me'sûm şêxê zemîn
Bavê 'Ula û Izzeddîn
Binyat û bavik paqij in
Dara te yî hişk bûye şîn

Şewqa te xelk tev kirne sir
Vîndar li bejnê bûne pir
Bo dîtina bejna xweşik
Her dem dihatin bir bi bir

Bo vê demê ew serwer e
Gav gav li dûv pêxember e

Rêz û xwedarêz mû bi mû
Serbest ewî anî ser e

Xwendin li Xizna kirye çem
Wek xwendina Misr û Ecem
Buxara û Sumerqend e
Kirye bihar ev çax û dem

Şêxê hezar û çar sedî
Min pey hezarî hê nedî
Keskî di rengê wî mezin
Şêxê zeman jê bûn fedî

Bi bêhn û şewqê kanî ye
Dûv Ehmedê Rebanî ye
Hingî nîşan jê bûn xuya
Gelek digotin: Muhdî ye

Xelkê ji malê xwe qerîn
Hatin li te kirne nerîn

Mewdan û zêr çûbûn ji dil

Xwe j' agirê dojê kirîn

Te li vê demê daxist hewar

Nav her kesî bû zare zar

Bawer kirin ku dem nema

Ref ref dihatin ber bi xwar

Bû sosreta çax û demê

Nêzîk û dûr hatin cemê

Kêfa wî da nîvê dila

Kul dibhûrî wek qeşemê

Bû şêst û sê salê ewî

Cîhan li ber wî bû hewî

Pir xwest ku bighê cem Xweda

Canê xwe da wî Xusrewî

Sar bûn ji wî kom û civat

Cîhan seraser bûne mat

Hîmek ji hîmê dîn weşî
Roja me çû piştî hilat

Em bûn cihê derd û kula
Agir ketin cerg û dila
Derdê me dijwar e, belê
Tiştê dila nayê mila

Hey can te em berbat kirin
Serxoş û dîn û mat kirin
Çavên me rohnî tê nema
Te bax û gul bê kat kirin

Ber ez li cîhanê nebim
Ber gotiyê canê te bim
Ma pey te de cîhan çiye?
Ez dê çilo nûka hebim

Min pir ji te hêvî heye
Tu zanibî ev kole ye

Her dem bi te zarî dikî

Rawestiye li bendê te ye

Cihkî ji bo min kar bike

Min bi xwe re rizgar bike

Ez destedaw û gende me

Di hingî bo min çar bike.

***

## Şîna Şêx Ulaeddînê Xiznewî

Ulaeddîn dizanim tu çi seydakî dilovan î
Bi zanîn û bi tevdêra bi her tiştî tuwî kanî
Tu hosta ye, ji bona dil bi rohnî tariyê zanî
Di pey Me'sûm û Ehmed re sitûna Neqşebendan î
Di vê çaxê gunehkaran li Til Me'rûf tu serkanî
Kesê carek dibînî te didî pesna bi şîranî
Di nîv hozan û pêşkêşa te hilda beyreqa banî
Qulûz û xwendin û tore ji bo wan tu derîzanî
Kumendarek ji yê Ehmed dizanim ku tuwî îro
Ji alî Neqşebenda tu bi durvî hem bi nîşanî

Tuwî nêrgiz bi bejna xwe çi dêmê te girover bû
Bi çavan ku dikir awir wekî heyva geş û zer bû
Ji wî bîn xweş belabûye gulav û misk û 'ember bû
Kesê carek bidîta ew Buhişt û bax û kewser bû
Di nîv cerga de şêrîn e şepal û naz û dilber bû
Rêzan û bînxweş û xwendin di çaxê wî de bênder bû

Wekî şêr û pilinga bû bi sehwa xwe li her der bû
Hinav û dil wekî lempê ji zêr û zîv û gewher bû
Siparê Neqşebenda ye Xwedê gelkî hiner danê
Bi pesn û nav û nîşana dikir bawer yek û fer bû

Belê hîn tirh û nazik bû ji êşa wî xwe winda kir
Ji malê xatirek xwest û bi qutbûnê ewî bakir
Di çaxê jîr û textora li navê wî temaşa kir
Xwedê tiştek mezin hingî ji nîv cerg û dila rakir
Ji hawîr pêtiyê nûrê ji ser laşê xwe bala kir
Xwedê ew bir Buhişta xwe ji heyv û roj û sala kir
Civata xanim û qîza bi nêrîna xwe wî şa kir
Xwezî bimrim bibim gorî ji bona şêx Ulaeddîn
Birîna wî keser da dil ciwan î rengê kala kir

Tu şêrînê mi bû Seyda ji bona min tu serdar î
Emê çawa bikin derbas bi vî derd î bi vî karî
Bi şûna xwe te kî rakir? ku rahêjî evî barî
Te Izzeddîn birayê xwe nîşan kirye di vî warî
Ewê bajo rewîna te di rengê te bi wî darî

Ulaeddîn dikim hêvî bike mehder li min jar î

Ji ber min ve piyê Me'sûm biramûse du sed carî

Evîna wî ji dil naçî heta ku ez neçim darî

Li ber çavan ji wî dûr im belê ez wî ji bîr nakim

Dilo nalîn bes in heyran çi bêjim tu gurê har î.

***

## Şîn

## Xurşîd ka Mihemmed?!

Xurşîd ka Mihemed kanî kurapê te yî pak
Ew jî gihaye Ehmed bûye mêvanê bin xak

Xurşîd tu tenê ma pey Mihemed wekî kurda
Dostê te yî hêja, ji ber çavan bûye winda

Şabaş ji Xweda re em çi bêjin ew dizanî
Ferman hat û lawê min ji mala min deranî

Hêzdan em in kole, em li ber te bê kilît in
Tevlî ku me rencî bo Mihemed gelek dîtin

Textora nikarîbû ku derman bikin peyda
Lewra ji evînê dil biraştî bûye şeyda

Arê vê evînê ji dû çavên wî di îsî

Hêvî ji Xweda ye wî evîndar bi nivîsî

Qîzek bi dilê xwe wî dixwest û negihiştê
Zarî ji ku maye bigihin hev di Buhiştê

Em çûn û hatin li Heleb çare nema bû
Textor go: Herin mal. Me dizanî ku cuda bû

Em hatin bi rê de ewî çavên xwe digirtin
Canê xwe sipart û dem û çaxê wî buhirtin

Ew jî giha Ehmed, me ew anî bi hewarî
Da em wî veşêrin nêzî Ehmed li vî warî

Hêzdan Tu dilê me bikî hênik nekî agir
Rohnî bê ji cem te cegerê me bibî dagir

Xorto hey Mihemed, ez çi bêjim tu wisa ye
Navê te xuya ye, tu şêrînê her kesa ye

Bejna te wekî hev, dev û lêvên te tenik bûn
Çavên te belek bûn, dêm û enî çi xweşik bûn

Çaxê te ye nûhatî û tirha te ciwan e
Çûna te li cem nas û nenasa çi giran e

Mela Mihemmed Emîn û bavê te yî hêja
Xal û xwediyê te bûne rengê ker û gêja

Bav û dê û apan tevî xalê te yî Ehmed
Canê xwe bihatin nedîn bo te ewan tu ked

Herê tu didîtî wî digo: Tu dilovan î
Xwîna te çi şêrîn û tu xortek navgiran î

Şah im bibihûrî di gunahê van mirovan
Roja paşî gihan hebî bona va dilovan

Xurşîd ger Mihemed çi hêja bû lê menal e
Em dê tev de bimrin, di vexwin em ji peyal e

Kurapê te gul bû, li kenarê çem giha bû
Qut bû ji wê avê lew gula wî pel ziwa bû

Hêvî ez ji bavê wî dikim hem ji xwedayan
Ku hew bikin der ew ji xwe ax û ûy û ayan

Em tevde ji bona we bira û dost û yar in
Em ji bo Mihemed dil birîndar û bi ar in

Jîna we dirêj bî hûn bi qencî her bimînin
Mala we bibî xweş kul û derda hew bibînin.

***

## Şîna Şehîd Remoyê Şêbî

Şehîdê min gula xorta dibêjin hatiye kuştin
Birayê min dilovano te em tev bê bira hiştin
Berî çûna te Rêzanî dil û canê me tev xiştin
Hevalên te hemû lal in, bi dilkî xweş ne rûniştin
Te Qamişlo kire dojeh ji xwînê hatine mijtin

Şehîd vêga mi dî sax e, çiz û winda bû hey bavo

Keç û xortên li Qamişlo Hilêlî, Enterî tevde
Ji bil navê te Rêzanî nema tiştek di ber dev de
Di nîvê rohnika rojê nema rohnî ketin şev de
Ji ber tîra dida derve, ji bo te ew ketin rev de
Bi vê çûna te dilsar in ji sehwa te ketin hev de

Şehîd vêga mi dî sax e, çiz û winda bû hey bavo

Emê çawa bikin kêfê li pey te hey hevalê min
Bi te Enteriyê şên bû te vala kir delalê min

Ber û fîşek çi xopan in te kuştin hey şepalê min
Li ber çavên mi reş bûne cih û mal û qepalê min
li ba min tu çi şêrîn î wekî pismam û xalê min

Şehîd vêga mi dî sax e, çiz û winda bû hey bavo

Şehîd herkes dibê baş e, ji wî kes gazina nakî
Ti kes îro xuya nabî, di şûna wî serî rakî
Ewî da pêşiya xortan bi dan û qencî û çakî
Gelo goman heye ku yek wekî wî xwesteka şakî
Li pey bavê Ciwan ka yê ji bo Kurdan xwe valakî

Şehîd vêga mi dî sax e, çiz û winda bû hey bavo

Şehîdê min çi zana bû, dizanim tu xebatkarî
Bi dilkî xweş bi mêranî te rahişte evî barî
Tu hêja bû di her tiştî neku tenha di vî warî
Te kum hilda ji Kurdan re, ji bo her doz û her karî
Bi heyrana du çavên tey belek bim ez du sed carî

Şehîd vêga mi dî sax e, çiz û winda bû hey bavo

Şehîd hostê me Kurdan bû, dikir qencî li ser jara
Me nedkir hêvî û goman, bibî para birîndara
Dibênim sosret û bêtar, bi kuştin wî jiyandara
Çi rojek bê qidoş hat û şehîd rakir ji nîv wara
Dilê mêr û jinê Kurdan ji bo merg û dilê yara

Şehîd vêga mi dî sax e, çiz û winda bû hey bavo

Di cadê re diçin hey wax, çima êdî te nabînim
Ji ber karê xwe winda ye, li ser te ez bi nalîn im
Li ser vê feleka bê bext, ji bo te ez ceger kîn im
Hewarê min li esman in, bi ax û keser û şîn im
Ji bo wan sêwî û jara, hejar û bê hiş û dîn im

Şehîd vêga mi dî sax e, çiz û winda bû hey bavo

Şehîd rabin bi ayînê wekî leşker şoreşgêr e
Evîndarê welatê Kurd piling û çêliyê şêr e

Ziman xweş bû dilovan bû ji bo dost û xuh û dêr e
Gelî Kurdan bikin bawer şehîd paqij wekî zêr e
Bikin pirsê şehîd kengî ji hînkar e kirin çêr e

Şehîd vêga mi dî sax e, çiz û winda bû hey bavo

Birayê şeş birakê jar tu bavê zariwê sêwî
Xuh û dê yextiyar û pîr ji cem wan tu biwî rêwî
Hevala tey ciwan ma bî, dilaşê te nema hêvî
Bimaçim her birînên wî, bidin oxir li wî dêwî
Bike çavnêriya dosta di gel te wê bibin cêwî

Şehîd vêga mi dî sax e, çiz û winda bû hey bavo.

***

## Şîna pêşmerge Îsmaîl

Şeva yekşem di bêşkata neha de
Di bîst û heftê tavhoza biha de
Çi bêtarê ji esmanî xwe dada
Li Îsmaîl ket laşê xwe rada
Mixabin hate kuştin ew bijarî

Zimanê me şikest in em gerîn mat
Kul û derdê me werhatin bi deh qat
Dil û navê me Kurdan bûne berbat
Li min bû reş şev û roj û dem û kat
Ti dermana bi derdê we nikarî

Emê çibkin herê karê me şîn e
Hewar û qîr û nalîn û girîn e
Dilê me bo Simaîl tev birîn e
Du çavên me perengê agirî ne
Gelî Kurdan bi lez hûn werne darî

Simaîl hey birayê min tu zanî
Kul û derdê me îro bûne kanî
Li ser cerga çi agir bû te danî
Hewarê min li ser te çûne banî
Hemî rohnî li cîhan bûye tarî

Tu jî wek Ebdullahê me cuda bû
Siparî ber siha textê Xweda bû
Ji wê yek hemberê hêz û seda bû
We xatir xwest çikû cîhan geda bû
Li ser canê we sed qencî bibarî

Li we herdûka dijmin pir dipirsî
Ji êrîşê we herdûka ditirsî
Gelek rojên dirêj hûn mane birçî
Firokê dijmina ser we kirin sî
Li we agir ji jêr û jor dibarî

Simaîl tu ciwamêr û dilêr î
Di cengê de, di tarê de diwêrî

Leheng û pêlewan û merd û mêr î

Di gel şêr û pilinga her diçêrî

Te jîna xwe ji bo Kurdan kir diyarî

Bira ez bo te bê endîş û gêj im

Li ser te rondikê xwînê dirêjim

Çiqa pesna li ser bejna te bêjim

Ezê bêhtir hinavê xwe kevêjim

Te pir dîtin ji bo Kurdan hejar î

Çiqa xwîna te şêrîn e hevalo

Zimanê te çiqa xweş bû delalo

Bi rabûnê bi rûniştin şepalo

Bi heyran bim dilê min her li balo

Xwezî min tu ne dîbûna ti carî

Bira her tu ji bo Kurd hatî kuştin

Jin û zaro, bî û sêwî te hiştin

Li jêr qada me kuştî wek te mişt in

Dilê Kurdan li ser wan pir biriştin

Tu dûrî mal û cih bûye veşarî

Bike bawer seraser tu li bîrî
Di nêv cergê me Kurdan de nedîrî
Çi pêşkêş û şoreşvan î tu çîrî
Ciwan î tu bi zanîna xwe pîr î
Di nav pêşmergeh û leşker siwarî

Diya zarokê Ismaîl de zûka
Werêne cem Simaîl wan piçûka
Li xwe komke heval û qîz û bûka
Veke gorê li Ismaîl ji nûka
Xwe êrîşkin ser û çavan biharî

Werin Enteriya mêran bibînin
Li ser sînga wî beybûna biçînin
Cilê wî cengedarî tev bi xwîn in
Tevî xwînê ji Mesûd re bişînin
Li pêşmergan bikin qîrîn û zarî
Bila zû bên li Ismaîl binêrin

Li ser wî kêf û govenda bigêrin
Bi ayîn û bi leşker wî veşêrin
Serê dijmin di ber wî de bihêrin
Li ser gorê bikin baxê biharî

Birayê min bila kêfa we xweş bî
Çi dem jîn û giyanê me di leş bî
Ewê şewqa we der navê me geş bî
Dema kul bên û ber çavên me reş bî
Bira hûn jî li pey rêka hezarî

Xwedê canê we derbaskî Buhiştan
Li nîvê bax û qûnax û surîştan
Di gel we em jî rûnin ber teniştan
Li ber awaz û saz û deng û qiştan
Bikin em tevde govendê bi larî.

***

# Şîna Hesen Elî

Nava Kurdan hewar e
Qîrîn û carecar e
Cergê Kurdan çi sar e
Şînê Kurdan likar in

Lewra Hesen cuda bû
Siparî ber Xweda bû
Ew hemberê seda bû
Lew em bi zarezar in

Agir kete hinava
Lingê me ketne dava
Jibîr bûn bûk û zava
Ronik hawîr dibarin

Hesen Elî çi bêjim
Ji ber te har û gêj im

Xwînê ji dil dirêjim
Hemû em Kurd heyran in

Em biriştin ji derdan
Li ser van xort û merdan
Dimirin di ceng û cerdan
Bê cih û bê sih war in

Hesen bila tu şa bî
Navê te her xuya bî
Bi pêşmergan teba bî
Bo te em hist û xwar in

Bira tu xweş heval î
Xebatkar û şepal î
Dilê min her dinal î
Li pey te em siwar in

Her kesekî ji kurdan
Li pey hev in bi kerwan

Ji wir heta bi Barzan
Ji mergê re zibar in

Oxir ji bo te xweş bî
Gora te şewq û geş bî
Rêça dijê te reş bî
Em çibkin em nikarin

Zanim tu dilbirîn î
Çaxê Leyla bibînî
Sipasê me bixwînî
Hûn herdû dost û yar in

Bibosin şapik û şal
Herin Newroz û sersal
Cem serokê me yî kal
Hûn hew bi dest neyar in

Bimaçim lêv û çavan
Du dest û ling û gavan

Hênik bikin hinavan

Hûn dûrî koledar in

Mizgînî bibne jê re

Bibêjin pê re pê re

Bo me geş bû sitêr e

Em bîrbir û şiyar in

Bibêje bo me digrîn

Kurê mam û keçê Zîn

Girêdane reş û şîn

Bi nalîn û hewar in

Pey de xatir bixwaz e

Di vê navê neraze

Veger malê ji gorê

Cergê me parepar in.

***

# Şîna Danîş

Carek me nedî vê felekê bextê me rakir
Salek me nedî cerg û dilê Kurdan te şa kir

Derdê me çi kûr in ji dem û katê diberdin
Miryê me yî Kurdan çi diçin zane û merd in

Va derda ciwanê me gerandin bê ked û kal
Têne wergerandin li me Kurdan her dem û sal

Vê rojê heçî Kurd in li ser Danîş dinal in
Xwenda û bilind û zanewer tevde dikal in

Danîş kurê Arif begê kurdî ku ji Me'eden
Derdê me yî pêşî te di îro kire nûjen

Lewra em dizanin xwendina wî çi bilind e
Şûna kul û derda çi diaxêvin ji bin de

Çavên te ziwa bûne çi heyfa te ciwan î
Berya te gelek çûne û li pey te rewan î

Baxê te yî gulgeş va di îro bûye zergûn
Mêrga te yî avî çilmisandin gul û beybûn

Hişk bûne seraser şax û tirhê te yî nazik
Destê te şikandin bi te çok û per û bazik

Pesnek ji Xweda re ku cih û warê te şîn in
Du kur hene bona te kulê min diweşînin

Lîvya di Îtalî bûye dilxweş bi herdûka
Hêzdan cihê Danîş bike dagir bi piçûka

Danîş li xwe negrî çikû jîna te bi hûr î
Eyman bide pey xwe bi firokê were Sûrî

Çaxê ku ti bê xwatir ji Elmanî bixwazin
Lewra bi te qencî kiriye ber nekî gazin

Dakev were Qamişlo ji bo em te bibînin
Bawer bike Danîş em ji bo dîna te dîn in

Lazgîn giha cem te da ji dûrî te werênî
Da laşê te rindî li Cizîrê bigerînî

Da em birînên agirê dilê bi girînê
Belkî bibî dermanek ji bo jan û birînê

Piştî te veşartin tu giha dost û hevala
Gava te guhartin gotinê qîz û rewala

Zûka tu li Nafiz Ehmed e beg bibe mêvan
Dêm û dev û çavên wî bimaçe wekî sêvan

Hemza bike ageh wê bi kêf bê te bibînî
Qasidkî ewê zûka j' bo Haco bilezînî

Govendekê deynin li wê hespa bibezênin
Tiştê hûn dizanin kul û derdê xwe bibêjin

Serbest bi delal î li kesê wir tu bipirse
Ew der ne wekî vir li belengazan bipirse

Sed carî silava ji devê min tu li wa ke
Rext û kemberê zîv li hevalê xwe bela ke

Mizgîn te bihîstin bi wa komê bigihîne
Rengê te hemî Kurd in dilê wan bi birîn e

Merga te birader em kirin pêtî û zorê
Derdê te ji bîr nakim heta ez herim gorê

Danîş tu bijî canê te çû navê te sax e
Pesnê te di rabûra me Kurdan de çirax e.

***